Kanton Zürich
Bildungsdirektion
Volksschulamt

# Çarçoveya Planê Hînkirinê ji bo Hîndekariya Ziman û Çanda Welêt (ZÇW/HSK)

## Bi ravekirinên şertûmercên giştî yên hîndekariyê



# Naverok


Destpêk ..... 3

**1 Armanca Çarçoveya Planê Hînkirinê ..... 5**

**2 Têgîn û ramanên bingehîn 7**
- Têgîn ..... 7
- Ramanên bingehîn ..... 7
- Avayî û binyat ..... 8

**3 Têgihiştina hînbûn û hîndekariyê ..... 10**
- Hîndekariya li ser bingeha şarezayiyê ..... 10
- Nirxandina li ser bingeha şarezayiyê ..... 10
- Dersa malê/erka li malê were kirin ..... 11
- Alavên hînkirinê û materyalên hîndekariyê ..... 11
- Hilbijartina rêbazan ..... 12
- Bêalîbûna hîndekariyê ..... 12

**4 Beşa «ziman» 14**
- Wate û diyarkirina armancên qada beşê ..... 14
- Dîdaktîka pirzimaniyê ..... 15
- Qadên şarezayiyê ..... 15

**5 Beşa «xweza, mirov û civak» ..... 18**
- Wate û armancên beşan ..... 18
- Qada şarezayiyê ..... 19

**6 Ji bo hînkirina di her yek astê de ..... 23**
- Asta 1 ..... 23
- Asta 2 ..... 24
- Asta 3 ..... 24

**Pêvek I: Şertûmercên giştî yên li kantona Zurichê ..... 32**

**Pêvek II: Ast û mijar– awirek giştî ..... 37**
- Ez û yên din – ..... 37
- jiyana bi hev re ..... 37

**Pêvek III: Çavkanî ..... 43**



**Agahiyên çapê**

**Weşan**
Birêvebiriya Perwerdeyê ya Kantona Zurichê,
Saziya Xwendegeha-gel

Bi hevkariya berpirsyariyên ZÇW hatiye amadekirin.

Şêwirmendiya zanyarî ji aliyê
Dr. Ursula Ritzau, PH FHNW û
Prof. em. Dr. Dr. Basil Schader, PHZH ve

**Rûpelsazî**
raschle&partner, raschlepartner.ch

**Têkilî**
Saziya Xwendegeha-gel, Şaxê Bipêşdebirina Taybetî
Beşa Pedagojiya Navçandî
Walchestrasse 21, 8090 Zurich
+41 43 259 53 61
lkp@vsa.zh.ch / www.zh.ch/hsk

Die Orientierung an diesem Lehrplan wird auch in anderen Kantonen empfohlen: Basel-Landschaft, Basel- Stadt, Bern, Glarus, Luzern, Schaffhausen, St. Gallen und Thurgau.

**Kanton Zürich**
**Gemeinnütziger Fonds**

Finanzielle Unterstützung durch den gemeinnützigen Fonds des Kantons Zürich

**Nûkirina têrûtije ya cara 4. a 2023an**

© Birêvebiriya Perwerdeyê ya Kantona Zurichê

# Destpêk

Bipêşdebirina şarezayiyên *pirzimanî û transçandî*, di nav erkên pêwîst ên xwendegehê de ne. Ev armanc, di Hîndekariyên Ziman û Çanda Welatê-jêder (ZÇW) ên ji derfetên Xwendegeha-gel tên pêşkêşkirin de jî tê şopandin. Di vê hîndekariyê de, zarokên *duzimanî, pirzimanî* û ciwan, şarezayiyên xwe yên di *zimanê welêtê-jêder* de bi pêş de dibin. Wekî din, li ser *jîngehê* û çanda welatê-jêder zanista xwe bi pêş dixin. Hîndekariya ZÇW, li Kantona Zurichê ji aliyê *dewletên jêder* û komeleyên taybet ve tên dayîn. Ev yek, zêdeyî pêncî salan e, ji Birêvebiriya Perwerdeyê desteka pîşeyî (teknîkî) û îdarî distîne.

Birêvebiriya Xwendegeha-gel a Kantona Zurichê sala 2011an ji bo vê hîndekariyê, bi çarçoveyeke planê hînkirinê hewl dide alîkariyê bi birêvebirên ZÇW û kesên din ên pispor re bike, da ku çarçoveyeke planê hînkirinê ya li kantonên din ên almanîaxêv jî were bikaranîn bipêş de bibin. Armanc gihandina hev a planên hînkirinê yên yeko yeko tên pêşkêşkirin û lihevanîna wan a bi planê hînkirinê yê xwendegeha-gel re bû. Di vê Çarçoveya Planê Hînkirinê ya berdest a li ser xebat hatiye kirin de, guhertinên polîtîkayên perwerdeyê li gor pevkirina bi Planê Hînkirinê-21 re, hatine kirin. Bi vê yekê re, di nav vê xebatê de sererastkirinên di warê naverok û ziman de yên bi hevkariya mamosteyên ZÇW, birêvebiriyên saziyên ZÇW û hin kesên din ên pisporên vê beşê re hatine esasgirtin hene.

## Ji bo çêkirina vê weşanê

Çarçoveya Planê Hînkirinê xwe li Planê Hînkirinê-21 ê Xwendegeha-gel digire. Hinek bendên nivîsê yên Planê Hînkirinê-21 ji ber vê yekê rasterast yan jî bi kêmguhertinan di vê weşanê de hatine bicîkirin. Beşa 1 wate û armanca Çarçoveya Planê Hînkirinê rave dike û kurtenêrînekê li ser Hîndekariya ZÇW a ji destpêkê heta îro dide. Beşa 2 agahiyên bingehîn şîrove dike. Beşa 3 têgihiştina hînbûn û hînkirinê digire dest. Beşên 4 û 5 cih didin her du beşên «ziman» û «xweza, mirov û civak» ê. Li gel vê wateya beşê tîne ser zimên û dawî beşên şarezayî yên dikevin nav şarezayiyên têkildar vedibêje. Hinek birêvebiriyên ZÇW herwiha mamosteyên wan rêbazên avakirina şarezayiyan bi xwe diyar dikin. Ji ber vê yekê beşa 6 xwe bi ramanên gelemperî yên yeko yeko astan bisînor dike.

Ferhengok (beşa 7), ji ber beşeke mezin a ferhengoka Çarçoveya Planê Hînkirina ZÇW a berê hatiye girtin. Hinek guhertin li gor ferhengoka weşana EDKê ya bi navê "Hîndekariya Ziman û Çanda Welêt ZÇW" (Anja Giudici, Regina Bühlmann 2014) hatine kirin. Ferhengok cih dide hemû têgehên di vê nivîsê de bi awayê *xwar* hatine nivîsîn. Ji van yên girîngtirîn yên li jêr in: Zimanê di Hîndekariya ZÇW de tê hînbûn, ku ev ji bo piraniya zarokan *Zimanê wan ê yekem*, ji bo hinekan *Zimanê-duyem* e. Ev planê hînkirinê yê berdest zimanê xwendegehê di hîndekariya ZÇW de wek *zimanê welatê-jêder* destnîşan dike.

Di pêvekê de (beşa 8), bingehan zagonî yên hîndekariya ZÇW a li Kantona Zurichê û herwisa agahiyên Saziya Xwendegehên-gel a li ser pêkanînên wan cih digrin. Li gor her astê awirek li ser mijarên dikarin bên dayîn û herwisa çavkaniya di nivîsê de derbas dibe, hatiye pêvekirin.


FACE CLUB

# 1 Armanca Çarçoveya Planê Hînkirinê

Armanca vê Çarçoveya Planê Hînkirinê, bersivandina pêdiviyên rojane yên zarokên *duzimanî* yan *pirzimanî* yên tev li Kursên ZÇW dibin e û ev bi Planê Hînkirinê-21 re hevseng e. Armanca bikaranînê bi sê aliyan e:

Destpêkê Çarçoveya Planê Hînkirinê alîkariya birêvebiriyên ZÇWê dike, ku planên xwe yên hînkirinê bi pêş de bibin û bi Planê Hînkirinê-21 re koordîne bikin. Tevî vê yekê, rewşên cihêreng hene: Birêvebiriyên ZÇW, ên pêşniyareke nû ya hîndekariyê çêkin, dikarin vê çarçoveyê wek rênîşana sazkirina plansaziya xwe ya hîndekariyê bi kar bînin. Berpirsyarên xwedî piştgiriya dewletî, bi giştî planê hînkirinê yê ji aliyê wezareta perwerdeyê ya *welatên-jêder* ve hatine pêşkêşkirin, bi kar tînin. Divê ew naveroka planê xwe yê hîndekariyê, li gor pêdiviyê wisa hevseng bikin, ku ev bi armanc û naveroka Çarçoveya Planê Hînkirinê ya ZÇW re ji hev bigire û bi wê re nekeve nakokiyê. Hemû birêvebiriyên ZÇW dikarin li gor pêdivî û şertên xwe, giraniyê bidin ser yeko yeko şarezayî û beşên Çarçoveya Planê Hînkirinê. Ji ber ku zarok tenê di hefteyê de du yan çar saetên hîndekariyê tên cem wan û komên şagirtan ji aliyê temen, zanîna heye û performansê ve bi piranî ji komên newekhev pêk tên, divê pêdiviyên wan ên pêşemîn werin diyarkirin.

A duwemîn Çarçoveya Planê Hînkirinê ya Birêvebiriya Perwerdehiyê, bingeha ezmûna fermîbûna kursên birêvebiriyeke ZÇW ye. Fermîbûn wê tenê gava kursên berpirsyariyan û planên wan ên hînkirinê û hîndekariya wan li gor Çarçoveya Planê Hînkirinê be, pêk were.

Ger planeke hînkirinê ya welatê-jêder hebe, divê ew wisa bê sazkirin, ku çawa ew û Çarçoveya Planê Hînkirinê ya ZÇW hevseng bin û di rewşeke lihevnekirinê de jî karibin bigihînin hev. Bi riya vê erkê di birêvebirina pêvajoya fermîbûnê de ev planê hînkirinê yê berdest ji bo berpirsyariyên ZÇW û kursên wan werin fermîkirin, pêwîstî ye: Ew çarçoveyê wiha diyar dike, ku karibin wê bi armancên xwe yên taybetî û naveroka planê xwe yê hînkirinê re bikin yek û derbasî nav hîndekariya xwe bikin.

A sêyemîn; Çarçoveya Planê Hînkirinê ji bo hemû beşdaran, wek bingeha têgihiştinê xizmetê dide: ew ji bo berpirsyariyên kursan, mamosteyên ZÇW, rayedarên niştecih û yên kantonan û herwisa ji bo institutên perwerdeyê bingehekî hevbeş ê ji bo şert û merc, armanc, naverok û têgehên hîndekariya ZÇW pêşkêş dike. Ev Çarçoveya Planê Hînkirinê li gor şert û pêdiviyên rojane yên li kantona Zurichê hatiye çêkirin. Qesda ji gotina “Planê Hînkirinê-21” Planê Hînkirinê-21 ê Zurichê ye.

**Ji destpêkê heta roja me hîndekariya ZÇW**
Kursên ZÇW ên destpêkê yên li kantona Zurichê, di salên 1930î de, bi insiyatîfa penaberên siyasî yên Îtalî çêbû. Bi zêdebûna hatina koçberên îtalî re, jimara van kursan her gav zêdetir bûye. Di dawiya salên 1960î û destpêka salên 1970yî de ji aliyê malbatên ji netewên din jî, derfetên/xizmetên bi vî awahî bi pêş ketin. Ji aliyê *dewletên-jêder* ên têkildar ve hêdî hêdî girtineke ser xwe ya vê xizmetê bi pêş ket. Şêwra Perwerdehiyê (îro Şêwra Hîndekariyê), destpêkê di 21ê Hezîrana 1966an de di vê mijarê de biryar girt û destûr da, ku kursên bi vî awahî bi armanca ceribandinê, di polên xwendegehan de werin birêvebirin. Lê destpêkê, ev yek tenê ji bo hîndekariya îtalî bû û wekî din jî hîndekarî nikarîbû di dema „diyarkirî ya dersdana xwendegehan de“ bihata dayîn.

Şêwra Perwerdehiyê, bi biryara xwe ya dawîn a di 16ê Gulana 1972an de, wek ji bo îtalî, ji bo kursên ZÇW ên spanyolî jî şaredariyên xwendegehan azad berda, da ku di demên hebûna xwendegehê de jî cî ji wan re were dayîn. Di heman salê de, Konferansa Swîsre ya Birêvebiriyên Perwerdehiya Kantonan (EDK), destûra dayîna 2 saetan hîndekariya ZÇW ya di nav dema perwerdehiyê de, pêşniyar kir.

Di sala 1982an de konsulxaneyên giştî yên îtalî û spanî û her wiha „Koma Koordînasyona Yekîtiya Malbatên Xerîb a li Zurichê“, ji Şêwra Perwerdehiyê daxwaz kirin, ku kursên ZÇW li giştiya kantonê


wek xizmetên xwendegehê werin dîtin û deqdayînên (notên mamoste bidin şagirtan) bawernameyên ZÇW derbasî ser bawernameyên xwendegehê werin kirin. Şêwra Perwerdehiyê bi biryara xwe ya di 8ê Mijdara 1983an de, ev daxwaz li ber çav girt û bi armanca ceribandinê, bikaranîna vî mafî, ji bo kursên bi vî awahî yên hemû netewan nas kir. Vê sazkirina nû, hêjabûna kursan bilind kir û ew zêdetir dan nasîn. Di heman demê de sazkarên kursan, bi rayedarên Zurichî û bi mamosteyên xwendegehên asayî re di nav hevsengiyê de, dest bi xebata bi hev re kirin (bipêşdebirina planên hînkirinê yên taybetî û pirtûk û alavên hîndekariyê, perwerdehiya pîşesazî, projeyên pîlot). Piştî pêvajoya ceribandina heşt salan, tecrubeyên hatine bidestxistin hatin nirxandin û di encama vê yekê de, Şêwra Perwerdehiyê roja 11ê Hezîrana 1992an, li ser «Pêkanîna Kursên Ziman û Çanda Welatê-jêder» rêvebirnameyek derxist. Vê biryarê; hîndekarî li xwendegehên-gel ên kantona Zurichê hilgirt saxlemiyê. Bi vê yekê re cara yekem rêvebirnameyê, derfeta fermîbûna kursên ji aliyê rayedarên nedewletî ve dihatin dayîn jî rewa kir. Di nav zagona Saziya Xwendegeha-gel a 2005an de û di nav rêziknameya Saziya Xwendegeha-gel a sala 2006an de hîndekariya ZÇW gihişt bingehekî nû yê zagonî.

Di salên 1980yî de li kêleka îtalî û spanyoliyan, çend welatên din ên koçber Yûgoslavya, Tirkiye, Yewnanistan û Portekîz jî hîndekariya ZÇW pêşkêş kirin. Ji destpêka salên 1990î û vir ve, jimara sazkarên kursan bi berdewamî zêdetir bû û îro kursên ZÇW ên gihiştine fermiyeta kantonî bi 31 zimanan tên pêşkêşkirin

Jimara şagirtên tev li kursan dibin di sala hîndekariyê ya 2009/10an de cara yekem bi ser 10.000î ket. Lê belê rêjeya beşdaran li gor zimanan pir cuda ye û ev yek girêdayî gelek sedeman e, ku wek girsbûna koma zimên, rewşa fînansî û sazkirinî ya birêvebiriyên kursan, destekdayîna ji aliyê dewleta-jêder ve û hwd.

Pêkhatina bi awayê curbecur a hîndekariya ZÇW, cudayiyên navbera birêvebirî û civakên zimên nîşan dide. Ev tiştekî girêdayî têgihiştina hîndekariyê, paşxaneya koçberiyê yan penaberiyê, tecrubeya dîrokî yan nêrîna li ser jiyana li Swîsreyê ye.

Di esasî de, hîndekariyên ZÇW, divîbû ji bo kesên vegerin *welatên-jêder*, tevlêbûna (ji nû ve ya) li xwendegehê hêsantir bikira. Bi herikîna demê re, paşxaneya şagirtan xwe guherand û pê re armanca hîndekariyê jî guherî: ji ber ku tibabeke pir kêm ji şagirtan vegeriyan *welatên-jêder*, armanca hîndekariyê xwe guherand destekdana *integrasyon*a wan a li nav civakê ya zarokên ji nifşên yekem û duyem ên koçber. Herwisa êdî zarokên malbatên duneteweyî yên ji bo wan ne *integrasyon*, ne jî “vegera paşde” ne mijareke watedar bû, dest bi tevlêbûna hîndekariyê hatin kirin.
.
Ji bo hemû şagirtan di heman demê de bipêşdebirina *pirzimanîbûn*ê, ya girêdayî *zimanê-welatê-jêder* wek armanceke serbixwe û grîng, xwe saz dike. Bi vî awayî ji bikaranîn û lêkolînên pedagojîk zanistiyek dertê, ku *pirzimanîbûn* bi hîndekariyê re dewlemendiyekê saz dike. Ji destekdana wê ne tenê kes, lê belê giştiya civakê fêdeyê dibîne. Li kantona Zurichê 43% şagirtên xwendegeha-gel bi *zimanekî-yekem* ê ji almanî cudatir diaxivin (statîstîkên perwerdeyî yên kantona Zurichê, li gor 2020an). Divê ev potensiyela *pirzimani*yê were destekdan û bikaranîn.



# 2 Têgîn û ramanên bingehîn

## Têgîn

Di hîndekariya ziman û *çanda* welatê-jêder de zarok û ciwan şarezayiyên xwe yên bi *zimanê* xwe yê *welatê-jêder* ê ne bi almanî bi pêş de dibin. Ev ji bo *zimanê-yekem* an *zimanê-duyem* jî wisa ye. Herwisa xwendekar zanîna xwe ya li ser *çand* û *jîngehên* xwe, bi taybetî li ser *çand*, dîrok, wêje, erdnîgarî û kevneşopiyên herêmên-jêder ên malbatên xwe, kûrtir dikin. Ew ji bo karibin hevsengiyê bi civakên cihêreng re pêk bînin, li ser rewşa xwe dihizirin û ger ev li Swîsre ango di rewşeke li *welatên-jêder* de be, jêhatiniyên xwe bi pêş de dibin. Bi riya dersan wê bi gelemperî alîkariya bipêşdeçûna wan a zimanî, zanînî, civakî û hestedarî were kirin.

Ji bo bi bingeha zagonî re nakokiyekê çêneke, wê binavkirina “Ziman û Çanda Welatê-jêder“ di vê Çarçoweya Planê Hînkirinê ya li ber destê we de were parastin, herçendî bi gotinî ne zelal be jî: tenê ji bo zarok û ciwanên ji kêmîneyekê tev li vê hîndekariyê dibin bi awayekî vekirî û zelal *welatên-wan-ên-jêder* welatê wan e. Ji vê zêdetir piraniya wan li Swîsreyê jidayik bûne û li nav *jîngeh* û *çandên* cihêreng tevdigerin.

## Ramanên bingehîn

- Hîndekariya ZÇW, şagirtan li gor temen, zanîna heye û asta performansa wan -di *zimanê* wan ê *welatê-jêder* de bi pêş dixe.

- Hîndekarî xwe bi nirxên ku di Planê Hînkirinê-21ê de bi sergotara „Xalên Bingehîn“ li bin sernivîsa „Armanca Perwerdeyê“ wek rênîşana xwendegehê hatiye formulekirin re, bi taybetî bi xalên li jêr re dike yek:

  › „Xwendegeh ji aliyê siyaset, ol û mezheban ve bêalî ye.
  › Xwendegeh derfetên wekhev dide pêş.
  › Xwendegeh wekheviya zayendî dide pêş.
  › Xwendegeh li dijî her awayên cudakariyê ye.
  › Xwendegeh têgihiştina ji bo dadmendiya civakî, demokrasî û parastina hawirdoreke xwezayî hişyar û teşwîq dike.
  › Xwendegeh di jiyana bi hev re ya bi mirovên din re de, bi taybetî girêdayî *çand*, ol û awayên jiyanê, rêzdariya beramberî teşwîq dike.
  › Xwendegeh wiha dihesibîne, ku hewcedariyên cuda yên hînbûna zarok û ciwanan hene û bi awayekî avakar bi pir-rengiyê re mijûl dibe.
  › Xwendegeh di civakeke piralî de alîkariya hevgirtina civakî dike.“

- Hîndekarî, hişmendiyê xurt dike, ku *duzimanî* yan *pirzimanî* potansiyeleke alîkar (pêvekî) ya şagirt karibin bi kar bînin ava dike. Ew qiymetê dide pirzimaniyê, da wek nirxekî civakê bi erênî were têgihiştin.

- Hîndekarî di danûstendina bi *mînakiyên-nasnameyî* yên cihêreng ên bingeha xwe ji girêdayîbûn, *çand*, kevneşopî û dîrokê digirin de piştgiriya pêkarînê dide zarok û ciwanan. Bi vê yekê re wê tecrubeyên kesanî û zanînî yên hem *welatên-jêder* hem jî Swîsreyê werin gengeşekirin, kûrkirin û nîşandan. Hinek nirx, adet, dîrok û ol jî tevî vê ne. Ji aliyê din ve qasidiya hînkirina olî ya mezhebî û bîrdoziyên siyasî (partî) eşkere ye, ku di hîndekariyê de cî nagirin.

- Hîndekarî, jêhatiniyên xwendekaran ên çareserkirina pirsgirêkan*, jêhatiniya wan a transçandî* û jêhatiniya wan a nirxandinî bi pêş dixe. Ew danûstendineke vekirî, ne cudakar û rêzdar a li hember mirovên din teşvîk dike.

- Hîndekarî, destekê dide *integrasyon*a zarok û ciwanên bi *paşxaneya koçberiyê* yên li xwendegeha-gel.
- Hîndekarî şertûmercan diafirîne, ku şagirt karibin *şarezayiya xwe ya pirzimanî û trans-çandî* di rojên pêş de ji bo domandina xwendina xwe û bidestxistina pîşeyê -hem li Swîsreyê û hem jî li welatên-jêder bi kar bînin.
- Hîndekarî, piştgiriyê dide şagirtan, ku li Swîsreyê û li welatê jêder bi kesên bi heman zimanî diaxivin re bidin û bistînin.
- Hîndekarî piştgiriyê dide şagirtan, da karibin medya û çavkaniyên li gor temenê xwe bi *zimanê welatê* xwe yê *jêder* bi kar bînin.
- Hîndekarî li ser tecrube û baldariyên zarok û ciwanan tê sazkirin û baldariyên wan ên nû şiyar dike. Ew li gor derfetan bala wan rasterast dikişîne ser tişta hînbûnê û hînbûna wan bi danûstendina wan a zimên ve girê dide, ev li kêleka tiştên din bi riya bikaranîna medyaya elektronîk a di hîndekariyê de (malper, medya civakî yên bi zimanê welatê jêder û hwd.) pêk tê. Gavên hînbûnê û erk li gor asta (rewşa) kesane ya şagirtan e.
- Hîndekarî cih dide alavên lîstikî û gotûbêja devkî. Li bexçê zarokan danûstendin bi bingehîn bi awayê lîstikî ye.
- Hîndekarî derfetên bi livûtevgera şagirtan a di nav ziman û *jîngehên* cihêreng de bi awayê taybetî derdikevin holê, bi kar tîne. Ji ber vê yekê ew bi awayekî rêkûpêk tecrubeyên kesî yên şagirtan digire dest û beramberkirinê wek prensîbeke dîdaktîkî ya bingehîn bipêş dixe. Hîndekarî bi riya beramberkirina *zimanê welat-jêder* bi almanî û bi beramberkirina bi zarava(yan) û herwiha zimanê standart ê almanî û *awayê standart* ê *zimanê welatê-jêder* re, şarezayiyên di zimanê tê qalêkirin de kûrtir dike. Ew bi beramberkirina *jîngehên* cihêreng têgihiştina wekhevî, cudayî û taybetmendiyên girîng kûrtir dike.

## Avayî û binyat

Ji ber Çarçoveya Planê Hînkirinê ya ZÇW li gor Planê Hînkirinê-21ê ye û ew avayî û termînolojiya wê ji xwe re digire, li vir avayiya Planê Hînkirinê-21 bi kinayî tê ravekirin. Agahiyên berfirehtir dikarin di sergotarên bi navê „Awirek giştî“ û „Agahiyên Bingehîn“ de werin dîtin.

### Planê Hînkirinê-21: Ast û binyat

Planê Hînkirinê-21 li Swîsreyê ji yazdeh salên xwendegehê yên mecbûrî yên dabeşî sê astan dibe pêk tê. Asta yekemîn ji du salên bexçê zarokan û du salên pêşî yên xwendegeha seretayî pêk tê  (heta dawiya pola 2.) Asta duyemîn ji çar salên xwendegeha seretayî (pola 3. Heta 6.) û asta sêyemîn ji sê salên xwendegeha navîn (pola 7. Heta 9.) pêk tê.


Planê Hînkirinê-21 ji şeş beşan pêk tê: Ziman; Matematîk; Xweza, Mirov, Civak (XMC); Şikildan; Muzîk û herwiha Livûtevger û Werzîş. Ji bo her beşê wê şarezayiyên ku şagirt di dema xwendegeha-gel de bidest dixin, werin vegotin. Herwisa di nav Planê Hînkirinê de modulên navdisiplînî „Medya û Informatîk“ û “Rênîşana pîşeyî“ hene.

Di nav planê beşan û hînkirina modulan de şarezayiyên navdisiplînî (yên kesanî, civakî û rêbazî) û herwisa mijarên navdisîplînî di bin sergotara Ramanên Bingehîn ên Bipêşdeçûna Domdar de (RBBD), hatine bidestgirtin.

**Planê Hînkirinê-21: Avakirina şarezayî**
Her yek ji beşên pisporî yên Planê Hînkirinê-21ê li ser qadên şarezayiyê hatine dabeşkirin. Wek mînak qadên pisporî almanî, ingilîzî, îtaliyanî û fransî her yek ji wan li ser beşên „guhdarîkirin“, axavtin“, „nivîsîn“, „ ziman(ên) bal liser“ û „wêjeya bal liser“ (beşa almanî) beramberê „Çandên bal liser“ (beşên inglîzî, îtalî, fransî) ne. Di her beşa şarezayiyê de şarezayiyên cihêreng tên formulekirin û avayiya wan tê nîşandan. Ji bo her şarezayiyekê her asta bendewariya avakirina zanîn û karînê, bi astên cihêreng tê vegotin. Ev *astên-şarezayiyê* nîşan didin, ku şarezayî bi domandina bê navber a di heyameke diyarkirî de tên bidestxistin.

**Çarçoveya Planê Hînkirina ZÇW:**
**Binyat û avakirina şarezayî**
Di vê Çarçoveya Planê Hînkirinê de binbeşek li ser bidestxistina yek bi yek şarezayî û astên şarezayiyan kêm e. Ew erka her yek ji berpirsyariyên ZÇW bi xwe ye, ku şarezayiyên taybetî û naveroka li gorî wê destnîşan bikin, ji bo mamosteyên ZÇW karibin hîndekariya xwe bi awayekî destnîşankirî amade bikin.

# 3 Têgihiştina hînbûn û hîndekariyê




Xêzerist 1: Bidestxistina şarezayiyan (Bide ber hev. Planê Hînkirinê-21, Beşa „Têgihiştina Hînbûn û Hîndekariyê“).

## Hîndekariya li ser bingeha şarezayiyê

Hîndekariya Ziman û Çanda Welêt xwe dispêre ser bingeha şarezayî û bidestxistina şarezayiyê yê wek Planê Hînkirinê-21ê. Bi vê yekê re ew giraniyê dide ser, bê divê şagirt kîjan zanîn û kîjan jêhatinî û hostayiyan di qada beş û beşên şarezayî de bi dest bixin. Şarezayî gelek taybetmendiyên naverokî û pêvajoyê dihewîne: Jêhatinî, hostayî û zanîn, lê amadebûn, helwest û raman jî. Bi ya dawîn re, li kêleka taybetmendiyên *girêdayî-çandê*, pîvanên hînbûna-serbixwe, hevkarî, motîvasyon û dilxwaziya karkirinê tê destnîşankirin.

Şarezayiyên werin bidestxistin xwediyê xwezayeke hem qada beşê û hem navdisiplînî ne. Şarezayiyên qada beşê zanîna li ser beşê û jêhatinî û ramanên girêdayî wê diyar dikin. Şarezayiyên navdisiplînî lîstina roleke girîng a zanîn û karînê ya di giştiya hînbûnê de destnîşan dikin. Herwisa di nav vê de şarezayiyên kesanî, civakî û rêbazî jî hene.

Di hîndekariya li ser bingeha şarezayiyê de naveroka hînkirinê û şikildana wê ya dîdaktîkî û rêbazî wisa tê bidestgirtin, ku şagirt karibin şarezayiyên tên xwestin hîn bibin û saxlem bikin. Mamosteyên ZÇW li ser bingeha Çarçoveya Planê Hînkirinê ya ZÇW û alavên hîndekariyê dihizirin, bê kîjan armancên şarezayî dikarin bi riya kîjan naveroka beşan û mijaran werin dayîn. Ew li ser vê bingeha rewşên hînbûnê û dersên hînkirinê wisa ava dike, ku şagirt karibin şarezayiyên têkildar bi dest bixin. Ew di koma fêrbûnê de girîngiyeke mezin dide şert û mercên heterojen.

## Nirxandina li ser bingeha şarezayiyê

Di nav hîndekariya li ser bingeha şarezariyê de çandeke nirxandinê ya têkildarî gihiştina armancên şarezayiyê heye. Nirxandina çêker taybetmendiyeke sereke ya kalîteya hînkirinê ye û piştgiriyê dide hînbûn û bidestxistina şarezayiyê. Şagirt bi awayekî çêker/teşekar (pêrebûna pêvajoyê: agahiyên li ser bingeha destekdanê yên bi derfetên siberojê re dikarin werin baştirkirin), bi awayekî cewherî (pêvajoya dawî, hesabkirin) û herwiha bi awayekî texmînî (bipêşbînî: nirxandin, ka bê şertûmercên ji bo hînbûneke serkevtî di kêliyên hînbûnê yan di astên xwendegehê de hatine dayîn) tên nirxandin.

Ji pola 2. şûn de, şagirt ji bo serkevtin û bipêşdeçûna xwe, di hîndekariya ZÇW de deqekê (pûan/not) distînin.

Mamosteyên ZÇW yên kursên fermî yên ZÇW, vê deqê, di dawiya her dewreyê de, ji bo her zarokê derbasî ser bawernameyê dikin. Mamosteyên polan ên têkildar, vê deqê derbasî ser bawernameya xwendegeha-gel a Zurichê dikin. Di bexçê zarokan û pola yekem a xwendegeha seretayî de zarok deqdanê nastînin. Mamosteyên ZÇW dikarin bi dayik û bavê zarokan re, li ser astên bipêşdeçûna hînbûna zarokan axavtina danezanê bikin.

**Şarezayiyên navdisiplînî**

Deqdan li ser asta gihiştina şarezayiyên tên xwestin ên şagirtekê/şagirtekî û li ser biserxistina kîjan pêngavên hînbûnê yên di hîndekariya ZÇW de agahiyan dide. Mamosteyên ZÇW dikarin bi dildarî qadên şarezayiyê yek bi yek binirxînin. Ji bo asta 1 û 2 ev in: Guhdarîkirin, xwendin, axavtin, nivîsîn, giranîdayîna ser ziman(an), giranîdayîna ser wêjeyê; herwiha xweza, mirov, civak (XMC). Ji bo asta 3 ev in: Guhdarîkirin, xwendin, axavtin, nivîsîn, giranîdayîna ser ziman(an), giranîdayîna ser wêjeyê herwiha xweza û teknîk (XT) / aborî, kar, karê-navmalê (AKK) / Cih, dem, civak (CDC) / ol, çand, exlaq (OÇE).

Deqdayîn, divê bi armancên planê hînkirinê yê birêvebiriyên kursan saz dikin re yan bi yên ji aliyê wezaretên perwerdeyê yên *welatê-jêder* ve hatine diyarkirin re û divê bi şarezayiyên di vê Çarçoveya Planê Hînkirinê de hatine diyarkirin re hevseng be. Deqdan performans û şarezayiyan îfade dike -ne livûtevgerên xemxwarî yan birêkûpêkbûna demî. Di nirxandina performans û dayîna deqan de bi bingehîn pîvana deqdana li Xwendegeha-gel a Zurichî esas tê girtin.

Deq, performansa giştî ya zarokekê, herwiha ya ciwanekî ya di hîndekariyê de dinirxîne. Ew ne tenê nîşaneya performansa di ezmûnên fermî de, di heman demê de, di nav dersan de çavdêriya mamosteya/yê ZÇW a li ser performansa beşan (wek mînak xwebilêvkirina devkî, çavdêriya li ser pêvajoya hînbûnê û hwd.) jî digre nav xwe. Ji ber vê yekê, deqdan ne encama komkirin û dabeşkirina yeko yeko ezmûnan e.

Mamosteyên ZÇW, gava mamosteya/yê polên têkildar serî li wan bide, di warê nirxandina şagirtan de (bi taybetî têkildarî biryardana derbaskirina polê) alîkariyê didin wê/wî.

## Dersa malê/erka li malê were kirin

Dersa malê dikare bi pêşkêşkirina derfeta bikaranîna alavên hînbûnê yên derveyî dema hîndekariyê, destekê bide pêvajoya hînbûnê. Bi gelemperî, divê zarok û ciwan karibin dersên xwe yên malê bê alîkariya rasterast a dayikûbavên xwe çêkin. Lê belê, di dersên malê yên bi rêbaza gotûbêj an lîstikan tên çêkirin de, fêdegirtina ji şarezayiya zimanê welatê-jêder ê dayikûbavan dikare watedar be. Ji vê yekê tê hêvîkirin, ku dayikûbav baldarê hînbûna zarokên xwe ya di hîndekariyê de bin. Ev yek dikare bi xebateke baş a bi dayikûbavan re, wek mînak di çarçoveya civînên bi dayikûbavan re bên kirin de yan jî bi serdana wan a xwendegehê re were teşwîqkirin. Gava mamosteyên ZÇW dersa malê didin, divê performansa kesanî ya zarokan û temenên wan li ber çav bigirin. Divê mamoste xwe ji barlêkirina zêde dûr bigrin û bi kardayîna li gor asta wan daxwaza zarokan xurt bikin.

## Alavên hînkirinê û materyalên hîndekariyê

Alavên hînkirinê û materyalên hîndekariyê, ji aliyê birêvebiriyên ZÇW ve tên hilbijartin û dayîn. Divê ew jêhatiniyên cuda yên hînbûnê, armancên hînbûnê û herwisa rewşên taybetî (*duzimanî* yan *pirzimanîbûn,* tecrubeya penabertiyê) yên xwendekaran li ber çav bigrin. Ew bi riya şopandina vê yekê, ji bicîanîna pêdiviyên Çarçoveya Planê Hînkirinê re dibin alîkar. Ew dikarin li kêleka alavên hînkirinê yên kevneşopar (pirtûk, defterên xebatê û hwv.), medya elektronîk jî (fîlmên bi têketina online, telefonên dîtbarî, medya civakî û hwd.) bi kar bînin.

## Hilbijartina rêbazan

Mamoste di şikildana hîndekariyê de –di çarçoveya prensîbên hînkar ên vê Çarçoveya Planê Hînkirinê- de, di hilbijartina rêbazan de azad in. Mamoste di rewşên diyar ên hîndekariyê de, li kêleka armanc û naveroka têkildar, rêbazên herî baş ên li gor şagirtan û li gor xwe hildibijêrin. Divê bala xwe bidin ser bikaranîna nêzîkatiyên pir-rêbazî, zanekirina rasterast, hînbûna kifşker, xebata bi plan, hîndekariyên projeyî, xebatên bihevreyî û hwd.

Neqandina rêbazan bi piranî avahiya heterojen (newekhev) a şagirtan dide der: şagirt ji pol an xwendegehên cuda tên, ew ji komikên temenên cuda ne, xwediyê raboriyeke cuda û astên cuda yên zimanê-yekem an zimanê-duyem in.

## Bêalîbûna hîndekariyê

Hîndekariya ZÇW ji aliyê siyasî û olî ve bê alî ye. Ew nêrîna cîhanê ya piralî dişopîne û destê xwe ji her awayê bandorkirinên siyasî û netewperestî vedikişîne.

Hîndekarî bi şîroveyên cihêreng ên pêvajoyên dîrokî re mijûl dibe (bi beşa „Agahiyên dîdaktîkî yên cihî, demî û civakî“ ya Planê Hînkirinê-21 re bide ber hev): Rastiyên dîrokî dikarin werin sehkirin. Ji aliyê din ve şîrovekirina rastiyan girêdayî nêrîn, cih û baldariyan e.

Gava hîndekariya ZÇW li ser olê radiweste, armanc zanîna li ser olan e, ne dayîna baweriyeke olî ya diyar an pêkanîna çalakiyên oldarî ye. Hîndekarî helwesteke bêalî, vekirî û nezîkatiyeke ne cudakarî ya ji ol û nêrîna li cîhanê re derdixe pêş (bi beşa têkildar a bi navê „Agahiyên Dîdaktîkî ya Exlaq, Ol û Civak“ a Planê Hînkirinê-21 re bide ber hev).

Bêalîbûna hîndekariyê wiha dibe: wek mînak gava sirûda netewî ya welatekî tê pêşkêşkirin, li ser naveroka wê tê rawestin û bi ciyê wê yê dîrokî ve tê girêdan. Li aliyê din, ger berî her dersê sirûda netewî bi hev re were gotin, nasnameya netewî ya yekalî were bipêşdedan û serbilindiya netewî bi zanebûn were avakirin, wê demê bêalîbûna hîndekariyê tê binpêkirin.



# 4 Beşa «ziman»

## Wate û diyarkirina armancên qada beşê

**Awayên standard û refleksiyona ziman**

Hîndekariya ZÇW heta ji dest were bi awayê standard ê zimanê têkildar pêk tê. Di rewşên nepêkanbûna vê de, dikarin ji bo saxlemkirina têgihiştinê awayên *zaravayî* û/yan jî almanî were bikaranîn. Hîndekarî xwe dispêre ser asta zimanzaniya heyî ya zarokan a welatê-jêder a ku dikare li gor her zarokê tê de cudayiyên mezin û awayên *zaravayî* hebin.

Ji bo bikaranîna zimanê netewî, pêwîstî bi bikaranîna awayê nivîskî, bi têkiliya çanda nivîsê ya *welatên-jêder* û bi zanîna *awayê wî yê standart* heye. Ev armanc xizmeta navbenykariya rêzimanî, rastnivîs û herwiha awayên li gor temen ên refleksiyona zimanî û dayîna ber hev dikin. Şagirt wê ji bo kêliyên hînbûnê yên motîvekar werin teşwîqkirin, ku li ser aliyên cihêreng ên zimanê xwe yê *welatê-jêder* bihizirin (wek mînak: *zarava* û cudayiyên wan, bipêşdebirina zimên, peyvên ingilîzî û yên din ên biyanî, cudayî û wekheviyên avanî yên bi almanî û zimanên din ên li xwendegehê tên bikaranîn).

Xebata li ser gencîneya peyvan (tevî bikaranîn û navbenkariya qalibên hevokan û hwd.) rê dide, ku xwe di rewşên cihêreng û mijarên cuda de bi awayekî rewa bîne ser zimên.

Şagirt heta derfet hebe li ser hev û rasterast tecrube dikin, bê çawa dikarin zimanê axavtin û nivîsînê bi kar bînin. Ji bo vê mamosteyên ZÇW li kêleka pêşniyaran, bûyerên rojane jî li ber çav digrin. Ew bi riya bidestgirtina afîranêr a nivîsarên bijare yên wêjeyî û herwiha bi nivîsên rastîn (otantîktir) û motîvekartir ên medya klasîkî û nûjen, bala wan dikişînin ser *awayê standard* ê *zimanê welatê jêder*.

### Pircureyîbûn (heterojenî)

Hîndekarî vê rastiyê digire ber çav, ku şarezayiyên zimanzaniya welatê-jêder ên şagirtan dikare cihêreng be. Ev yek wek mînak ji şarezayiyên devkî, berfirehiya gencîneya peyvan, pêbaweriya *awayê standart* ê *zimanê welatê-jêder* û tecrubeyên nivîsînê, şarezayiyên rêzimanî û rastnivîsî pêk tên. Ji bo mirov karibe li gor tê xwestin bi vê pircureyîbûnê mijûl bibe, mamoste li gor derfetan hîndekarî û dersê dadixînin asta şagirtan.

### Beramberkirina zimanan

Zarok û ciwan girêdayî pêdiviyên xwe yên zimanî, *zimanê xwe yê welatê-jêder* bi almanî û bi zimanên din ên biyanî yên dibe ku li xwendegehê tên bikaranîn re didin ber hev û bi vî awayî têgihiştina xwe ya zimanzanî û hişmendiya zimanzanî (*hişmendiya-zimanî*), bi pêş de dibin. Têgihiştina ji aliyên dişibin hev û cihêrengiyên di navbera *zimanê wan ê welatê-jêder* û almanî û herwiha zimanên din ên li xwendegehê tên bikaranîn de, alîkariyê dide wan, ku di wî zimanî de riya xwe bibînin û bi xwe bawer bibin. Projeyên zimanî yên beramberkirinê, gava bi hevxebata bi zimanên xwendegehên seretayî re werin pêkanîn, bi taybetî berhemdar dibin.

### Şarezayiyên zimanî yên navdisiplînî û yên li gor beşê

Şagirt zimanê xwe yê welatê-jêder ne tenê bi jêhatiniyên bingehîn ên ji danûstendina jiyana rojane dinasin, bi pêş de dibin, lê belê ew şarezayiyên xwe yên zimanî yên navdisiplînî û xwe dispêrin beşê jî, ji bo nivîsên cihêreng ên bi hînbûna zanînî ya li xwendegehê tên ferzkirin, bi pêş de dibin. Şarezayiyên ziman ên navdisiplînî rê didin, ku ew têbigihêjin rastiyên tevlihev û razber û wan formule bikin, girêdanên sedemî nas bikin yan jî nivîsa xwe bi xwe saz bikin. Şarezayiyên zimanî yên sparetyê pisporî peyvên teknîkî/pîşeyî, naverok û formulekirinên li gor qada diyar a beşê dihewîne.

### Nivîs

Li xwendegehên-gel, hemû zarok û ciwan bi zimanê almanî û nivîsa latînî hînî nivîsandin û xwendinê dibin. Di hîndekariya ZÇW de, şagirtên tev lê dibin, hînî nivîsa bi *zimanê xwe yê welatê jêder* dibin. Gava li wê derê nivîseke bi tevayî cudatir tê hînbûn, her du pêvajoyên bidestxistinê, bi piranî ji hev cudatir tevdigerin û pêwîstî bi koordînekirina teng nake. Gava di hîndekariya ZÇW de, nivîsa latînî, yewyanî ango krîlî tê hînbûn, mamosteyên ZÇW di pêvajoya hînbûnê de ji bo nekevin nav tevliheviyê, divê xwendin û nivîsandina almanî ya li xwendegehagel li ber çav bigirin. Divê mamoste cudayiyên ji alfabeya almanî zanibin û karibin wan şanî bidin. Gava hînbûna her du zimanan di heman demê de were destpêkirin (alfabetkirna duzimanî) xwe li ser rewş û rêbazên alfabeya li polên seretayî yên zarokên têkildar, agahdar dikin. Ew li gor pêdiviyan bi mamosteyên têkildar ên polên seretayî re dipeyivin.

## Dîdaktîka pirzimaniyê

Wek di hîndekariya ziman a li xwendegehên seretayî de, di hîndekariya ZÇW de jî mebest ne kamilkirina *duzimanî yan pirzimaniyê*, berûvajî hînkirina *pirzimaniya bikêrhatî* ye. Planê Hînkirinê-21 di agahiyên dîdaktîkî yên sernivîsa «ziman» de tişta dixwaze bibêje wiha îfade dike: «*Pirzimaniyeke bikêrhatî* giraniyê dide ser bideskevtiyek piralî, zindî ya bi astên cuda yên şarezayiyên pêşketî yên beşên cihêreng ên şarezayiyên wek zimanan, ku karibin di rewşên cuda de danûstendina zimanî bi awayekî serkevtî bikin. Şagirt di hînbûna zimên de li tiştên berê hînbûne vedigerin û xurçika pirzimaniya xwe wiha berhemdêr dikin».

Xurçikeke pirzimanî ji du yan pir zimanan pêk tê, ku ew di qadên cihêreng ên xebatê de (wek mînak, xwendegeh, dema azad, malbat) bi awayên cuda tên bilêvkirin û li gor hevsereke/î axavtinê, ango li gor naverokê tên bikaranîn. Bi piranî zimanek serdest dibe û ew ji aliyê xwendekar ve ji ziman(ên) din bi şarezayîtir, dilxweşîtir û bêtir tê bikaranîn û bi vî awayî serdestbûn bi demê re dikare cî biguhere. Di gelek rewşan de zimanê welatê-jêder an zimanê malbatê heta destpêkirina xwendegehê serdest e, lê zimanê almanî her ku diçe bi pêvajoya xwendegehê re ji bo şagirtan watedartir dibe û dibe ku serdest bibe. Wek rêgez kesên pirzimanî zimanên xwe û warên zimanên xwe ji hev bi hişkayî cihê nahêlin, li şûna wê dest diavêjin giştiya xurçika zimanên xwe û zimanên xwe bi rêkûpêk û guherbar bikar tînin.

«Tevlihevkirina zimanan» a di navbera *zimanê welatê-jêder* û almanî (almaniya swîsrî) de, wek gelek caran tê dîtin, divê bi awayekî kategorî ji hev neyê astengkirin û dûrxistin. Ew têkildarê rewşa mezinbûna di nav du zimanan de û di navbera du zimanan de ye û ew dikarin di warên cûda de (wek mînak, wek alîkariya têgihîştinê, dagirtina valahiyan, çalakiyên bi lîstikan) bikêrhatî bin (Bi benda «Mijûlbûna bi zarava û zimanê standart» a rêzepirtûkên hîndekariya zimanê welatê-jêder, navenda IPE, Xwendegeha Pedagojî ya Bilind a Zurichê re bide ber hev).

## Qadên şarezayiyê

**Pêşravekirinên li ser qadên şarezayiyê**

Qadên şarezayiyê yên li jêr û şarezayî ji Planê Hînkirinê-21 tên girtin. Bêguman ew xwe dispêrin ser formulekirinên şarezayiyên di *zimanê welatê-jêder* de.

Pênasekirina şarezayiyên taybetî û naveroka têkildar (dabeşkirina li gor ast û pileyên jêhatîbûnê) peywira yeko yeko birêvebiriyên ZÇW ye.

**Guhdarîkirin**

- Şagirt dikarin agahiyên girîng bi riya alavên guhdarîkirinê, bistînin.
- Şagirt dikarin axavtinan bişopînin û baldariya xwe şanî bidin.
- Şagirt dikarin ji axavtinan agahiyan bistînin.

**Axavtin**

- Şagirt dikarin livûtevgera şarezayiya axavtina xwe, vegotin û kontrolkirina deng bi awayekî rêkûpêk bikar bînin. Ew dikarin ji bo axavtina birêkûpêk û herak gencîneya xwe ya peyvan a berhemdêr û qalibên hevokan; her ku biçe di *awayê standard* ê *zimanê xwe yî welatê-jêder* de jî, çalak bikin.
- Şagirt dikarin xwe bi awayekî çalak tev li gotûbêjekê bikin û gotûbêjekê bidin destpêkirin.
- Şagirt dikarin di rewşên axavtina bi tenê xwe de (wek mînak, pêşkêşî, xwendina helbestê, …) xwe bi awayekî rêkûpêk û were fêmkirin îfade bikin.
- Şagirt dikarin pêşkêşiyên xwe yên axavtinî û livûtevgerên axavtinî bidin der.

**Xwendin**

- Şagirt dibin xwedî jêhatiniyên bingehîn ên xwendina bi *zimanê xwe yê welatê-jêder*.
- Şagirt dikarin li gor asta temen û pêdiviyên xwe ji nivîsên dixwînin agahiyên girîng bistînin.
- Şagirt dikarin li gor asta temen û pêdiviyên xwe nivîsên wêjeyî bixwînin, gengeşe bikin û rêûrêbazên xwendinê bi pêş de bibin.
- Şagirt dikarin rewşa xwe ya xwendinê û baldariyên xwe yên ji xwendinê re bidin der.

**Nivîsîn**

- Şagirt dikarin xwe bi *zimanê xwe yê welatê-jêder* li gor asta temen û pêdiviyên xwe, bi awayekî nivîskî bînin ser ziman. Ew ewlehiya di awayê standart ê zimên de zêdetir dike. Ew wek mînak dibin xwediyê xurçikeke qalibên hevokan û gencîneyeke dewlemend a peyvan.
- Şagirt gelek cureyên nivîsan dinasin û ew dikarin wan li gor armanca nivîsa xwe ya têkildarî hevoksazî, naverok ziman û teşe-şikil, ji bo berhemandina nivîsên xwe bi kar bînin.
- Şagirt dikarin -li ser bingeha pêdivî, daxwaz û mînakên li gor asta temenê xwe, nivîsên xwe bi awayekî hişmend û fêmbar ava bikin.
- Şagirt li gor temen, pêdivî û derfetan dikarin bibin xwediyê jêhatiniya formulekirina nivîsên bi awayekî rast û li gor awayê standart ê ziman.
- Şagirt dikarin li ser pêvajoya nivîsandina xwe û berhema nivîsê bihizirin û kalîteya wê binirxînin.

**Baldana ser ziman(an)**

- Şagirt girêdayî pirs û erkên rewa li ser *zimanê xwe yê welatê-jêder* dihizirin, (wek mînak veqetandek û tewang -zayendên rêzimanî- sazkirina hevoksaziya pirjimarî, dem, *zarava* û dîrok û hwv.). Bi vê yekê re ew ji bo taybetiyên *zimanê welatê-jêder* bikar bînin û nas bikin bi zimanê almanî û her wiha bi zimanên din ên li xwendegehê tên bikaranîn an axavtin re didin ber hev (*hişmendiya ziman/language awareness*).

- Şagirt dikarin bikaranîn û bandoriya zimên lê bikolin.

- Şagirt di seranseriya sala xwendegehê de bi riya avakirin û ceribandinê dibin xwediyê zanîneke rêzimanî û herwiha rastnivîsî.

**Baldana ser wêjeyê**

- Şagirt dikarin li gor asta temenê xwe nivîsên wêjeyî (yên wek metelokên zarokan, nivîsên stranan, nivîs, helbest, vegotinên devkî û hwd.) yên ji *çanda welatê-xwe yê-jêder* binasin.

- Şagirt dikarin li ser van nivîsan û têgihiştina ji wan, heman axavtinê bi rê ve bibin.

- Şagirt li ser wêjeya *welatê xwe yê jêder* (çîrok, kesayetên watedar û hwd.) dibin xwedîagahî.

- Şagirt dikarin di navbera nivîsên mijarên wan nêzî hev ên bi ziman û *çandên* cihêreng hatine nivîsîn de dayîneke ber hev bikin.

- Şagirt tecrube dikin, nas dikin û vedibiriqînin, ku nivîsên wêjeyî ji aliyê naverok, teşe û ziman ve ji bo xwe bigihînin bandoreke estetîk bi hişmendî hatine sazkirin. Ew taybetiyên bingehîn ên cure û awayan dinasin.



# 5 Beşa «xweza, mirov û civak»

## Xalên pêşîn ên baldariyê

Beşa Xweza, Mirov, Civak (XMC/bi almanî NMG), çar perspektîfên naverokî yên Xweza û Teknîk (XT/NT), Aborî, Kar, Karên-navmalî (AKK/WAH) Cih, Dem, Civak (CDC/RZG) û Ol, Çand, Exlaq (OÇE/RKE) vedihewîne. Di asta yekem û duyem de çar perspektîfên naverokî yên cihêreng di nav beşê de bi hev re hatine kurtebirkirin. Ji ber vê yekê Xweza, Mirov, Civak wê hem ji bo giştiya beşê ji asta yekem heta ya sêyem, hem jî ji bo planê hînkirinê yê beşan di asta yekem û duyem de were bidestgirtin. Di asta sêyem de wê çar perspektîf di warên beşên taybetî de bi rêzê werin pêşkêşkirin.

## Wate û armancên beşan

Şagirt bi jiyîna bi hev re ya rêzdarî ya bi mirovên ji *çandên* cihêreng tên re, bi danûstendinên pevkar û çareserkirina aştiyane ya nakokiyan, şarezayiyên xwe bi pêş de dibin. Beşdarbûna bê pêşdarazî û xwe-reflekskirineke wekhev alîkariyê dide van *şarezayiyên transçandî* -çi di navbera herêmên-jêder ên cihêreng, *zarava*, ziman û olan de, çi di navbera *welatên-jêder* û Swîsreyê de yan jî di navbera *welatên-jêder* û welatên din de be. Hîndekarî destekê dide helwesteke vekirî û bi xweşbînî. Ev yek ji hevrûkirina kesan a xistina qalibekî yan ji nêzîkatiya cudakariyê, dûr dimîne. Wek mînak, divê zarokek diyar ti carî wek nûnerê ol, netew an zimanekî diyar neyê fêmkirin.

Şagirt di hîndekariya ZÇW de rewşa xwe wek zarok û ciwanên bi *duzimanî* yan *pirzimanî* yên ji malbatên koçber an malbatên *pirzimanî* tên, dinirxînin. Wek girêdayî koma hînbûnê, heman *zimanê welatê-jêder* dijîn. Cudayî tecrubeyên wan ên kesanî û têkiliyên wan ên bi *welatên-jêder* re ne. Hîndekarî cudayiyên di nav welatê-jêder ên têkildarî girêdayîbûna olî, nêrîna li cîhanê, rewşa civakî, ziman (*cureyên zaravayî, pirzimanîbûn*) û erdnîgariya herêmî de li ber çav digire.

Hîndekarî nirxên ji Swîsreyê û ji *welatên-jêder* dike mijar. Gava hayê şagirtan ji wekhevî û cudayiyan çêdibe, ew nirxên xwe yên di warê cihêrengiyê de zelal dikin. Ev pêvajo bipêşdeçûna kesayetiyeke serbixwe ya bi çarçoveya referansên cihêreng re integre dibe, destek dike. Ew di heman demê de bixwebaweriya şagirtan xurt dike.

Hîndekarî mijarên rastîn digire dest û asta zanîna li ser çandên cihêreng kûrtir dike. Li gor mijarên taybet dikarin girêdaniyên çeperast û dayîna berhev werin çêkirin.

Hîndekarî tecrubeyên bi riya çûnûhatina koçberiyê çêdibin û têkelî jiyana bi hev re ya rojane ya di nav civakeke navçandî de ne, vedibiriqîne.

Şagirt dîrok, erdnîgarî ya *welatê-jêder* di nav nivîsên mînakî de hîn dibin. Ew têkiliya wan bi jiyana îroyîn a li *welatên-jêder* û li Swîsreyê re çêdikin.

Di hîndekariya beşan de şagirt têgehên nû yên wek kevirên lêkirina zanîna xwe û di heman demê de yên bipêşdebirina şarezayiya zimanî, bi dest dixin. Ji mamoste hişmendiyeke bilind a zimanî tê hêvîkirin, ku bi vê sedemê, ew karibe bi armanc û vekirî ji bo her dersê biwêjên pêwîst û gencineya peyvan a beşan bide û bihêle, ku werin ceribandin.

## Qada şarezayiyê

**Baldariyên pêşî yên qadên şarezayiyê**

Ev şarezayiyên li jêr bi taybetî ji bo hîndekariya ZÇW hatine bidestgirtin û li gor wê hatine formulekirin. Ev yek piştrast dike, ku taybetiyên hîndekariya ZÇW dikarin werin bidestgirtin. Prensîbên bingehîn ên rê şanî didin, di formulekirina şarezayiyên Planê Hînkirinê-21 de jî li gor heman hişmendiyê hene. Di rêzkirina li jêr de pêkanînên taybetî yên di hîndekariya ZÇW de wê bi ravekirinên şarezayî yên Planê Hînkirinê-21 ve bên hevsengkirin. Lêbelê ravekirinek pêvekî ya bi beşa Xweza, Mirov, Civak (XMC, asta 1 û 2) û herwiha ji bo asta 3, bi beşa Ol, Çand, Exlaq (OÇE) û Cih, Dem, Civak (CDC) û Aborî, Kar û Karê-navmalî (AKK) û herwiha Xweza û Tejnîk (XT) yên Planê Hînkirinê-21, watedar e. Wek mînaka beşa zimên, divê şagirtan şarezayî heta dawiya dema xwendegeha mecbûrî bi dest xistibin.

**Xweza, Mirov, Civak –**
**Ol, Çand, Exlaq**

Şagirt dikarin li yên din guhdarî bikin, hestan bibihîsin û bersivê bidin yên li hember. Ew wêneyê (mînaka) ji bo xwe û ji bo yên din bi xwe ava dikin, tim ji nû ve piştrast dikin.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**<u>XMC. 10</u>** “Civat û civak –
jiyîna bi hev re û sazkirina tevlêbûna wê“.

**<u>OÇE. 5</u>**: “ Ez û civat –
Sazkirina jiyanê û jiyîna bi hev re“.

– Ew bi *jîngehên* cihêreng ên *welatê-jêder* û Swîsreyê re bi saxlemî mijûl dibin û ji bo wê vekirîbûnekê bi pêş de dibin. Ew dikarin hesta girêdayîbûna xwe ya *jîngehên* cihêreng bidin der û vê yekê bi kesayeta xwe re bikin yek. Ew bi dilsoziyên cihêreng riyeke çêker dibînin.

– Şagirt dikarin nas bikin, ku di jiyana bi hev re ya mirovî de rêzgirtina beramberî û baldariya rêzgiran pêwîst e. Lêbelê, ew di heman demê de jî dizanin, ku rêzgirên wiha li ser nirx û pîvanan tên damezirandin jî guherbar in û dikarin werin guhertin.

– Ew dikarin binasin, ku bersivên gelek pirsên bingehîn, girêdayî nirx û nêrînên kesane ne. Ew nirx û kevneşopiyên girîng ên *welatê-jêder* û ji Swîsreyê yên girêdayî nirxên kesane û nêrînên li ser cîhanê ne dinasin û wan didin der. Ew nirxên girîng û kevneşopiyên ji *welatê-jêder* û Swîsreyê nas dikin û wan didin der.

– Ew dikarin hestên xwe û yên kesên din bi nav bikin û zehmetiyên nû gengeşe bikin. Zanîna bingehîn a li ser pêvajoya derûnî, hestyarî û laşî yên mirovan û gencîneyeke peyvan a bi zimanê *welatê-jêder* a li gor vê, alîkariyê dide wan, ew xwe û mirovên din hîn ji kûrayî fêm dikin û jiyana xwe bi rê ve dibin. Ew xwediyê têgehên pêwîst ên alîkariyê didin axavtina wan a li ser têgihiştin, pêwîstî û ramanên kesane ne.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.11**:"Tecrubeyên bingehîn, kifşkirin û dayîna der (reflekskirin) a nirx û pîvanan"

**OÇE.1**: „Dayîna der (reflekskirin) a tecrubeyên bingehîn ên hebûnî"

**OÇE.2**: „Zelalkirina nirx û pîvanan û berpirsyarbûna biryardanê"

– Ew nêrînekê bi riya danûstendinên hişmendî yên gelek tecrubeyên ji malbat, hevaltî, xwendegeh, *welatên-jêder*, netewa xwe û saziyên olî, li ser cihêrengiya jiyana bi hev re ya civatî û bandoriyên wê yên li ser hev, bidest dixin. Ew dikarin binasin, ku kes wek beşek ji civakê bandora xwe li ser dike û jê bibandor dibe.

– Nasîna wan bi *welatê xwe yê jêder* re heye. Ew bi endamên komên gelheyê yên cihêreng ên li *welatên-jêder* û li Swîsreyê re heta ji dest tê bêalî didin û distînin. Ew hewl didin, ku nirx û awayê jiyana wan fêm bikin. Ew dikarin pêşdaraziyên kesên din û yên xwe nas bikin û bi wan re bi awayekî çêker tevbigerin.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.12**: "Rasthatina li ol û bîrûbaweriyan"

**OÇE.3**: "Nasîna Şop û bandoriyên olan ên di çand û civakê de"

**OÇE.4.4**: "Xwemijûlkirina bi ol û nêrînên cîhanî"

**Xweza, Mirov, Civak –**
**Cih, Dem, Civak**

– Naverokên erdnîgarî, aborî û ekolojîk zanîna li ser *welatên-jêder* berfireh dike. Zanîneke rênîşanî ya bingehîn a li gor wê ji bo lênêrîna hişmendîtir dibe alîkar. Ew dikarin agahiyan ji çavkaniyên cûrbicûr bînin ba hev û binirxînin. Ev ji wan re dibe alîkar, ku riya xwe li *welatên-jêder* bibînin.

– Şagirt dizanin, ku mirov bi hest, raman û kirinên xwe bandorê li ser pêşveçûnan dikin. Ew bi pirsgirêkên herêmî, neteweyî û cîhanî re mijûl dibin û bandora wan a rasterast li ser jînwarê xwe fêm dikin.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.7**: " Derxistina encamê ji rêbazên jiyanê û cîûwarên jiyanê yên mirovan û dayîna wan a ber hev"

**CDC.2**: "Nîşankirina rêbazên jiyanê û cîûwarên jiyanê"

**CDC.3**: "Lêkolînkirina têkiliyên mirov û jîngehê"

– Bi riya kifşkirinên xwe û wêne, kart û alavên din ên medyayê (wek mînak malperên bi *zimanê welatê-jêder*) bi saya refleksiyon û dana ber hev bi Swîsreyê re, wêneyekî zelaltir yê *welatên xwe yê-jêder* bidest dixin.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 re**
**XMC.8**: “Mirov cîûwaran bi kar tînin – xwe lê digirin û bi xwe şikil didinê”

**CDC.4**: “Dîtina riya xwe ya cihûwarî”

– Şagirt hebûnên çandî yên *welatê xwe yê-jêder* ên niha û berê nas dikin û jê re rêzdar in.

– Ew li ser esasê zanîna rênîşaniya bingehîn dikarin bûyer, pêşveçûn û şahidiyên doh û îro yên *welatên-jêder* dabeş bikin. Dîroka koçberiyê di vê de roleke girîng dilîze.

– Ew ji mînakên hilbijartî dinasin, ku her têgîn subjektîf e û tê de nirxandin hene. Ew fêm dikin, ku berjewendî û nêrînên cuda dikarin li gor paşxaneya xwe ya dîrokî baştir werin fêmkirin.



**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.9**: "Fêmkirina dem, demdirêjî û guhertinê – Jihevnasîna çîrok û dîrokê"

**CDC.6**: "Ravekirina domdarî û serûbinbûnên dîroka cîhanî"

**CDC.7**: "Lêkolînkirin û bikaranîna çanda dîrokî"

- Ew derfetên tevlêbûna nav civakê û bandorlêkirin û parvekirina berpirsiyariya xwe ya li ser bipêşdeçûnên hene û yên siberojê dinasin.
- Ew tevî mafên zarokan mafên bingehîn ên mirovî dizanin û bala xwe didin ser wan.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.10**: Civat û Civak – Sazkirin û xwetevlêkirina jiyana hevpar.

**CDC.8**: Fêmkirin û xwetevlêkirina demokrasî û mafên mirovan.

**Xweza, Mirov, Civak –**
**Aborî, Kar, Karê-navmalî**

- Şagirt bi awayên jiyan û xebatê yên li welatên-jêder re mijûl dibin û ew dikarin wan bi yên li Swîsreyê re bidin ber hev.
- Li ser têkiliya di navbera siyaset, aborî û *çandê* de nêrîna wan heye.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**

**XMC.6**: "Kar, hilberandin û serfkirin –
Zelalkirina rewşan"

**AKK.1**: «Cîhana hilberandin û kar kifş bikin»

**AKK.3**: «Teşekirina serfkirinê (xwarinûvexwarinê)»

**Xweza, Mirov, Civak –**
**Xweza û Teknîk**

- Şagirt dikarin têkiliya xweza, teknolojî û mirovan di wateya pîvanên zagonên gerdûnî yên derbasdar de binirxînin.
- Ew bi mijarên girêdayî xweza û teknolojiyê re mijûl dibin û gencîneya peyvên têkildar ên bi zimanê xwe yê *welatê-jêder* berfireh dikin.

**Girêdanka bi Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.2:** "Ajal, şînayî û jînwaran kifş bikin û biparêzin"

**XMC.5:** "Encaman ji pêşveçûn û pêkanînên teknîkî derxin, wan binirxînin û bi kar bînin"

**XT.1:** Gewher û wateya zanistên-xwezayî û teknîkê fêm bikin.

# 6 Ji bo hînkirina di her yek astê de

**Laş, tenduristî, jêhatiniya-livûtevgerî**
**Lêhaybûn**
**li ser bingeha deman**
**Lêhaybûna li ser bingeha cihûbergan**
**Girêdan û birêkûpêkî ya**
**xeyal û afirîneriyê**
**Hînbûn û refleskirin**
**Ziman û ragihandin**
**Xweserî û livûtevgera civakî**

**Ziman**
**Matematîk (bîrkarî)**
**Xweza, mirov, civak**
**Sazkirin**
**Mûzîk**
**Tevgerîn û werziş**

Xêzerist 2: Nêzîkatiyên pêşketinê û beş
(Bide ber hev. Planê Hînkirinê-21, beşa “Xalên girîng ên asta 1.” an jî “Xalên girîng ên asta 2.”).

Mîna ku di beşên 2.3 de tê diyarkirin, ji ber ku di Çarçoveya Planê Hînkirinê de şarezayiyên tên bidestxistin li ser astên kesane û astên şarezayî nayên dabeş kirin, ew (Çarçoveya Planê Hînkirinê yê ZÇW) xwe ji Planê Hînkirinê-21 cihê dike. Pênasekirina şarezayiyên li gor astan û naveroka têkildar di bin berpirsyariya birêvebiriyên ZÇW de ye. Divê naveroka li jêr wek ramanên bingehîn ên ji bo astên kesane bên fêmkirin.

Piraniya şarezayiyan xwe dispêrin ser sê astên wek gergerînekê xwe li hev dipêçin û ava dibin. Lê avabûna hinek şarezayiyan ne di destpêka asta 1. de, lê di demeke paştir de dest pê dike, ji ber ku divê di pêşveçûn û fêrbûna zarokan de hin şert û merc bên cîbicîkirin. Avakirinên din ên şarezayî wê berî dawiya qonaxa 3. werin bidawîkirin.

## Asta 1

Di asta 1. de hînkirin bi xurtî ji bo pêşketina zarokan e û bi taybetî di serî de bi awayekî navdîsîplînî tê birêxistinkirin û amadekirin. Lîstik xwedî girîngiyeke mezin e. Ji bo ku ev rêbaz li ber çavan were girtin, Planê Hînkirinê-21 neh nêzîkatiyên pêşketinê nîşan dide, bê pêşketin û hînbûna zarokan çawa dikare bi asta 1. ve were têkildarkirin.

Zarok li bexçê zarokanê bi tecrube û tevgerên bihistyarî, bi awayekî serbixwe an jî bi riya teqlîdkirinê hîn dibin. Ew tiştên şênber herdem di vê çarçoveyê de hîn dibin. Ew tiştên bi awayekî rasthatinî yan bêhemdî hîn dibin, bi alîkariya mamosteyan vediguherînin têgînan (peyvan) û ew ji bo wan vediguherin zanîna eşkere. Wek mînak ew gavên xwe di ser pêlikên nêrdewanê re diavêjin û bi vî awayî hînî têgîna pêlikê dibin, lê pê re hînî teknîka xwehilavêtinê û hesta tirsê yan hesta serkevtinê jî dibin. Li gor vê yekê hîndekarî xwe dispêre ser tecrubeyên rojane yên zarokan û ji bo livûtevger û tecrubeyên wan rewşan diafirîne.

Hîndekarî ezmûnên ji zarokan re bibin alîkar ên ew karibin tiştên dîtbarî û ramanî veguhêzin awayê peyv û hevokan pêşkêş dike. Bipêşdebirina gencîneya peyvan –li kêleka *jîngeha* zarokan bikaranîna – peyvên hînbûna cihûbergan (li ku, paş, jor û hwd.) jî û ji bo têkiliyên hişmendî bikaranîna peyvên (zêde, kêm, wekhev pir û hwd.) li ber çav digire.

Hîndekarî zarokan bi riya lîstinê bi cîhana pirtûkên wêneyî û nivîsan dide nasîn. Zarok hîn dibin, ku nîşane, xêz û xêzewêne (piktogram) yên ji jiyana wan a rojane xwedî wateyekê ne.

Zarok tiştên tên nivîsandin û bikêrhatiya nivîsandinê nas dikin. Ew bi riya tecrubekirina alavên cihêreng ên nivîsandinê, ya bi awayekî li gor armancê û kontrolkirî, hînî bikaranîna wan dibin. Ew li gor şert û mercên xwe yên kesanî, dest bi xwendin û nivîsandinê dikin.

Ji bo zarokên di pola yekem û duyem de hemû tecrubeyên jiyana rojane ya di nav malbatê de çi li *welatên-jêder* û çi li Swîsreyê mijara destpêkê ye. Di vî temenî de girêdana bi malbatê ve û meyla ber bi nirxên wan ve hîn xurt e.

Di hîndekariyê de wê hemû şaxên (qadên) ziman werin bipêşdebirin: Guhdarîkirin û axavtin, xwendin û nivîsîn, giranîdayîna ser ziman(an), giranîdayîna ser wêjeyê. Bi vê yekê re berî her tiştî awayên hînbûnê yên bi lîstikan, lê ceribandinên xwedubarekar û xwedîarmanc jî tên bikaranîn. Di destpêkirina xwendin û nivîsandinê de, divê bi alfabetkirina almanî re were têkildarkirin. Nêzîkatiyeke koordînekirî ya di navbera mamosteyên ZÇW û mamosteyên polê de pir bi xurtî tê pêşniyazkirin. Ger watedar be, mamosteyên ZÇW ji bo pêşî li ber fêmkirinên şaş bigirin, bi alfabeya almanî re didin ber hev.

## Asta 2

Ji bo zarokên asta duyem, koma hevalên hevtemen pir girîng e. Ew baldariyeke xwezayî ji awayên cihêreng ên jiyanê û *jîngehên* pê re didinûdistînin re bi pêş de dibin. Bi gelemperî danûstendineke erênî bi hawîrdora wan (malbat, xwendegeh) re heye û vê yekê hema hema qet nakin mijara lêpirsînê. Ew bi gelemperî li hember *çandên* xwe û yên din bêalî, vekirî û ji ber xwe ne û ew baldarê têkilî û girêdanên bi endamên malbata xwe ya li *welatê-jêder* in.

Di hîndekariyê de wê hemû şaxên (qadên) ziman werin bipêşdebirin: Guhdarîkirin û axavtin, xwendin û nivîsîn, giranîdayîna ser ziman(an), giranîdayîna ser wêjeyê. Xaleke girîng a taybetî balê bidin ser, berfirehkirina şarezayiyên di qeydên rêzepeyvên zimanî yên zehmet û tevlihev de ye.

## Asta 3

Di asta 3. de, ciwan her ku diçe bi rexnegirî nêzî nirxên xwe û yên hawîrdorê dibin. Wek encama vê yekê, dibe ku ew ji nirx û normên kevneşopî dûr bikevin an dilbijiya wan bikin. Ew pirî caran wateya dersên ZÇW jî dipirsin.

Mamosteyên ZÇW vê rewşa serûbinî fêm dikin, bersivê didinê û bi awayekî rexneyî awayên (jiyan-)ên cuda dixin dersê. Bi vî awayî ji ciwanan re dibin alîkar, ku ew berê xwe rast bikin, kesayetiya xwe bi pêş de bibin û riya xwe bibînin. Bi taybetî, ew piştgirî didin ciwanan, ku tecrube, nirx û girêdanên cihêreng di nav jiyana wan de bigihin hev.

Hîndekarî şarezayî û zanîna kesane ya ciwanan digire ber çav. Ne tenê di dersên ZÇW de, lê di heman demê de, di dersên xwendegeha-gel û li derveyî xwendegehê de jî, ji bo şagirt karibin zanyariyên xwe yên taybetî yên trans*çandî û çandî* jî bînin ziman, tên teşwîq kirin.

Di hîndekariyê de ciyekî girîng ê ragihandina devkî û nivîskî, baldariyên ziman û perwerdehiya medyayê heye. Ciwan derfeta bikaranîn, şibandin û gihandina hev a zanînan şarezayiyên di zimanên cuda de bi dest xistine, dibînin. Ciwan derfeta bikaranîna şarezayiyên bidest xistine ya di zimanên cihêreng de (*zimanên welatê-jêder*, almanî, fransî, ingilîzî) dibînin, şibandinan dikin û zanîna xwe digihînin hev. Ew bi vî awayî dikarin şarezayiya xwe ya zimanî û danûstendinî berfireh bikin.

Hîndekarî ji bo bipêşdebirina perspektîfên pîşeyî û integrebûna nav hawîrdora pîşeyî û civaka Swîsreyê piştgiriyê dide ciwanan. Bi taybetî, ew wan teşwîq dike, ku *şarezayiyên* xwe yên *duzimanî* an *pirzimanî* û *transçandî* wek çavkaniyên pêvekî (berdest) fêm bikin û bikar bînin.

# 7 Ferhengok

**Ravekirinên li jêr diyar dikin, bê di vê nivîsê de têgînên têkildar çawa werin fêmkirin. Heya ku wekî din neyê gotin, ravekirinên li jêr li ser bingeha *Çarçoveya Planê Hînkirinê yê Ziman û Çanda Welêt (Welatê-jêder)* yê Beşa Perwerdehiyê ya Kantona Zurichê û li ser Weşana *Hîndekariya bi Zimanê Welatê-jêder*, ku ji aliyê Sekreteriya Giştî ya EDK ve hatiye weşandin, tên kirin.**

**Duzimanî**
→ Binêre *zimanê duyem.*

**Zarava:**
Zaravayek an devokeke awayê cîgehî yan herêmî yê zimanekî standard e (wek mînak almanî) yan jî zimanekî herêmî (wek mînak almaniya swîsrî).

Ew dikare xwe kêm an zêde ji *awayê standard* ê *zimanê welatê-jêder* cudatir bike û carinan wek *zimanê ciyekî* yan ê herêmekê bi kar were.

**Zimanê yekem (Z1), zimanê welêt (zimanê welatê-jêder)**
Zimanê civakîbûnê wê wek zimanê yekem were bidestgirtin, yanî zimanê ku mirov li gor rêzê pêşî fêr bûye. Di jiyana rojane de jê re "*zimanê dayikê*" jî tê gotin. Gelek zarok pêşî ne tenê yek, lê du yan jî zêdetir zimanan hîn dibin. Di rewşên wiha de, ango dema çend zimanên yekem ên mirov hebin, mirov behsa duzimaniya hevdem dike. Zimanê yekem dikare di berdewamiya jiyanê de wek zimanê serdest bimîne, lê di heman demê de bi taybetî ger ew ne li gor zimanê hîndekariyê û *zimanê cîgehî* yê niştewarê mirov be, ew dikare heta astekê watedariya xwe winda jî bike.

Zimanê welatê-jêder ê mirovekê/î ew ziman an zarava ye, ku li *welatên-jêder* an li herêmên jêder ên xwe wek awayê cîgehî yan standard tê hesibandin. Ger kesek ji nifşa duyem an sêyem a koçberan be, ne hewce ye ku zimanê wê/wî yê jêder herdem zimanê yekem be.

**Zimanê beşê**
Zimanê beşê *awayê zimanekî standard* ê *welatê-jêder* e, ku bi riya gencîneya peyvên taybetî yên beşê tên girtin (wateya peyvên beşê: peyvên wek ên teknîkî, pîşeyî, pisporî û hwd.).

**Zimanê biyanî**
Zimanê biyanî zimanek e, ku ji bilî zimanê xwe yê yekem tê hînbûn û li derveyî cihê *zimanekî cîgehî* tê dîtin. Bi vê sedemê, zimanê biyanî ji zimanê duyem ê ku li welatê zimanê armanc tê bidestxistin, cuda ye. Hînkirina hin zimanên biyanî erka xwendegehên giştî (xwendegehên dewletê) ye. Li xwendegehên giştî yên kantonên Swîsreyê, bi gelemperî zimanên fermî yên parçeyên din ên welêt û ingilîzî wek zimanên biyanî tên hînkirin.

**Pirzimaniya bikêrhatî**
Bi pirzimaniya bikêrhatî jêhatiniya mirov a li gor rewş û hewcedariyan axavtina bi çend zimanan tê destnîşankirin. Ev cureyê şarezayiya ziman, berûvajî *pirzimaniya* hevseng û sîmetrîk e. Bi riya ecibandina *pirzimaniya* bikêrhatî tê zanîn, ku jêhatiniyên bingehîn ên şarezayiya zimanî bi awayê cihêreng, ji hev cuda û baş bi pêş dikevin, hene. Ji ber vê yekê her gav ne hewce ye ku meriv di her jêhatîbûneke bingehîn de bigihîje asta herî bilind, carinan bicihanîna armancên xwe ya biserketina hin jêhatiniyan û şiyana bikaranîna wan a bikêrhatî têrê dike. Bipêşxistina xwendinê ya bi awayê *pirzimanî* ya bikêrhatî yek ji armancên xwendegeha giştî (ya dewletê) ye.

**Welatên-jêder, dewletên-jêder**
Bi gotina welatên-jêder ew dewletên (welatên), ku kesek an dêûbavê wê/wî (an jî xizmên din) berê li wir jiyane yan hîn jî lê dijîn, tê qalêkirin. Mirov dikare bi xurtbûniyên cihêreng bi welatên xwe yên-jêder re, wek mînak, bi nifşa koçberiyê ve xwediyê girêdayînan be.

**Zimanê-bilind**
➞ Binêre li *awayê standard ê zimanê welatê-jêder*.

**Nasnameya duçandî / nasnameya pirçandî**
Nasnameya (kesanî) wek taybetmendiya kesekê/î û xwenaskirin û lixwehaybûna vê tê fêmkirin. Nasname pêvajoyî û dînamîk in. Ew di danûstendinên civakî de, bi taybetî bi zimên tên afirandin. Nasnameya duzimanî-/pirzimanî wek têgihiştina hesta subjektîf a girêdayîbûna du (an jî zêdetir) kolektîfên cihêreng ên di heman demê de û xwepênasekirina bi parçeyek ji nirx û helwestên wan e.

**Integrasyon**
Di vir de integrasyon wek pêvajoya ku tê de mirov û komên bi paşxaneyên civakî, *çandî* û zimanî yên cihêreng, beşdariya civakî û siyasî ya wekhev a di civakekê de bi dest dixin û rêz ji paşxaneyên wan ên zimanî û *çandî* yên taybetî re tê girtin, tê fêmkirin.

**Şarezayî**
Pênaseya „şarezayiyan“ di beşa „Xalên-bingehîn“ a Planê Hîkirinê-21 de xwe dispêre ser ravekirinên Franz E. Weinert. Li gor wî, şarezayî "çend aliyên naverok û pêvajoyê dihewînin: jêhatinî, karîn û zanîn, lê di heman demê de dilxwazî, helwest û nêrîn jî. [...] Aliyên şarezayiyan li gor xwezaya xwe hem teknîkî û hem jî navdîsîplînî ne. Şarezayiyên teknîkî zanîna beşê û jêhatîbûn û karînên têkildar diyar dikin. Bi şarezayiyên navdîsîplînî zanîn û karîna kesanî, ya ku di fêrbûna li hundir û derveyî xwendegehê de li seranserê beşê roleke girîng dilîzin, tê vegotin. Di nav vê de şarezayiyên kesane, civakî û rêbazî hene.»

**Çand**
Çand di vê Çarçoveya Planê Hînkirinê de wek tevayî aliyên giyanî, madî û hestyarî yên yekane, ku civakekê yan komeke etnîkî diyar dikin, tê dîtin. Ev ne tenê huner û wêjeyê, lêbelê awayên jiyanê, mafên bingehîn ên mirovan, sîstemên nirxdanê, kevneşopî û baweriyan jî dihewîne. Mirov nikarin tenê wek endamên çanda xwe yan jî koma xwe ya etnîkî werin dîtin. Ji ber vê yekê ne hewce ye, ku bi sedema ew girêdayî çandeke diyar in, divê ew xwediyê hin taybetmendî, xislet an livûtevgerên diyar ên wê çandê bin. Bi ser de jî çanda civakekê yan jî komeke etnîkî ne wekjihev (homojen) û ne rawestiyayî û ne jî girtî ye. Belê, pratîka çandî bi berdewamî wateyên nû diafirîne û pratîkên çandî yên cihêreng xwe tev li hev (û din) dikin.

**Jîngeh**
Çarçoveya Planê Hînkirinê ji gotina jîngehê tevayiya hemû tişt, bûyer û rewşên mirov di dema xwe ya niha de pê re mijûl dibin, têdigihîje. Jîngehek girêdayî rewşên jiyana kesane tenê beşek ji tevayiya cîhanê ye. Çarçoveya Planê Hînkirinê veqetandineke vebirî di navbera çand û jîngehê de nake, lê bi terma duyemîn re balê dikişîne ser dema niha ya kesanî û danûstendin û axaftinên wê/wî bi xwe.

**Zimanê herêmî**
Zimanê herêmî ew zimanê ku piraniya gelheya niştewarekî pê didinûdistînin e. Di rewşa Swîsreyê de, zimanên herêmî yan *zaravayên* Almaniya Swîsreyî ne yan jî zimanên Fransî, Îtalî yan Retoromanî ne.

**Pirzimanîbûn, pirzimanî**
Têgîna pirzimanî tê wateya şarezayiya ku mirov dikare bi sê yan jî zêdetir zimanan biaxive. Ev têgîn dikare hem kes û hem jî hemû civakê îfade bike. Li Swîsreyê, ev carinan jî ji bo danasîna bûyera axavtina çar zimanên netewî, tê bikaranîn. Di Çarçoveya Planê Hînkirinê ya berdest de, gava qala keseke/kesekî pirzimanî tê kirin, ew tê wateya ku bi awayê çalak an neçalak -bê ku têkiliya xwe ya kesane bi van zimanan re hebe (zimanê-yekem, zimanê-duyem, zimanê welatê-jêder, zimanê biyanî) xwediyê şarezayiyên sê an zêdetir zimanan be. Di vê wateyê de, wek mînak gava zarokek wek zimanê-yekem bi almanî û bi ser de bi du zimanên din ên biyanî biaxive, ew dibe zarokeke pirzimanî.

➞ Binêre li duzimanî yan pirzimaniyê jî.

**Zimanê dayikê**
Bi gotina zimanê dayikê qala zimanê destpêkê tê bidestxistin, *zimanê yekem* tê kirin. Ev têgîn bi guman e, ji ber ku tê wateya tenê dayik li ser bidestxistina zimanê destpêkê biryardar e. Bi vê sedemê Çarçoveya Planê Hînkirinê tenê qala *zimanê yekem* dike.

**Hişmendiya Zimên (Language Awareness)**
Hişmendiya zimên (an jî Language Awareness) zanîna eşkere ya li ser zimên, têgihîştina hişmendiya zimên û herwisa hestiyarbûna ji bikaranîn û pêvajoyên hînbûna zimên re vedibêje. Danûstendina lûtkeya-zimanî (meta-zimanî), ji vê tê hesibandin, wek mînak, li ser veqetandin an jî tevlihevkirina zimanan û herwiha dayîna berhev a zimanan, wek mînak, di navbera *zimanê yekem* û *zimanê duyem* de yan jî di navbera zimanê standard û



*zaravayan* de. Armancên pedagojîk ên hişmendiya zimanî meraq û eleqeya bi ziman(an), baldarî û naskirina cihêrengiya zimanî (li polê yan li nav civakê) û herwiha nerîneke pirperspektîfî ya ziman û pêwendiyê ne.

**Awayê standard ê zimanê welatê-jêder**
Awayê zimanekî yê hatiye bipîvankirin, di ferheng û rêziman de hatiye birêgezkirin û girêdayî wê hatiye ravekirin, awayê standart ê zimanê welatê-jêder e. Carinan jê re dibêjin zimanê nivîskî, zimanê wêjeyî an jî zimanê bilind û bi gelemperî ji *zaravayan* tê cudakirin. Ger awayê standard herdem di rewşên diyar de (wek mînak di rewşên fermî de) were bikaranîn, lê wekî din di jiyana rojane de *zaravayek* were axavtin, jê re diglossie (duzimanî/duzaravayî) tê gotin. Serwextbûna awayê standard li xwendegehên fermî û di hîndekariya ZÇW de wek armanca sereke ya hewildanên dîdaktîka zimên tê hesibandin.

**Şarezayiya transçandî,**
**Hînbûna transçandî**
Şarezayiya transçandî jêhatiniya danûstendina bi awayekî serkevtî ya bi mirovên xwediyê raboriya çandî ya cihêreng re, vedibêje. Ew dikare bi riya hînbûna transçandî were bipêşdebirin û bi riya tecrubeyên li *jîngehên* cihêreng were destekdan.

**Zimanê duyem (Z2)**
Zimanê duyem ew ziman e, ku di wateya kronolojîk de di rêza duyem de tê hînkirin. Ji bo mirovên xwediyê paşxaneya koçberiyê ne, ev ziman pirî caran zimanê ku wan tev li jiyana civakî û çanda nivîskî ya civaka zimanî ya herêmî dike ye, ku ev wek mînak li aliyê Swîsreya almanîaxêv, almanî ye. Zimanê duyemîn bi piranî yan pirî caran bi pêwîstiya xwe ya ji bo çareserkirina hewcedariyên jiyana rojane, ji *zimanên biyanî* vediqete. Ger kes ji nifşa duyem an sêyem a koçberan bin, zimanê cîgehî/herêmî jî dikare bibe zimanê yekem û *zimanê welatê-jêder* jî bibe zimanê duyem, an jî Z2 dikare bi demdirêjiya xwendegehê re bibe zimanê serdest.

**Bidestxistina zimanê duyem**
Di dîdaktîka ziman de di navbera *bidestxistina zimanê* duyem û yê *biyanî* de cudayî tê kirin. Dema ku mirov zimanê xwe yê duyem li herêmeke ku ew ziman wek *zimanê cîgehî/herêmî* lê tê axivîn bidest bixe, ev bidestxistina zimanê duyem e. Hînkirina zimanê têkildar wê bi dîdaktîkeke li gor xwe were bidestgirtin, ji ber ku ji aliyê dîdaktîkî ve ji hînbûna *zimanê yekem* û ya zimanê biyanî cuda ye.

**Duzimanî yan pirzimanî, duzimanîbûn an pirzimanîbûn**
Duzimanîbûn an pirzimanîbûn di wateya herî berfireh de, ji bo kesa/kesê xwediyê şarezayiyên çalak an neçalak ên du yan zêdetir zimanan be tê gotin. Lê tevî vê di Çarçoveya Planê Hînkirinê yê berdest de pênaseyek tengtir tê bikaranîn: li vir wê tenê mirovên bi zimanê almanî û bi yek an bi gelek zimanên din ên *zimanên welatê-jêder* ên ne almanî diaxivin, wek mirovên bi duzimanî yan pirzimanî werin bidestgirtin.



# 8 Pêvek

## Pêvek I: Şertûmercên giştî yên li kantona Zurichê

**Ev pêvek destpêkê awireke giştî li ser bingehên nav-kantonî û zagonî yên hîndekariya ZÇW pêşkêş dike. Piştre Saziya Xwendegeha-gel a Zurichê bikaranîna (rêbaz, rêxistin, hevkarî) ku li kantonê ji ber şert û mercên zagonî hatiye bipêşdebirin, dide nasîn.**

### Agahiyên bingehîn ên nav-kantonî

Konferansa Wezîrên Perwerdeyê yên Kantonan (EDK) gelek caran li ser dersên ZÇW nirxandin kirin. Ew "Pêşniyarên ji bo perwerdehiya zarokên xwedî zimanên biyanî" yên 24ê Cotmeha 1991ê, mafê bingehîn ê "parastina ziman û çanda welatên-jêder" ên zarokên bi *paşxaneya koçberî*, dîsa erê dike. EDK bi vê armancê van pêşniyaran ji bo rayedarên kantonê û herwiha yên cîgehê/herêmê yên têkildar dike:

- bi awayekî rewa, li gor derfetan û li gor demên dersan di hefteyê de herî kêm du saetan destekdana hîndekariya ZÇW.
- bikaranîna avahiyên xwendegehê ya bi awayekî belaş
- teşwîqkirina hevkariya di navbera mamosteyên xwendegehê û yên hîndekariya ZÇW de
- di bawernameya xwendegehê de diyarkirina tevlêbûna şagirtan a hîndekariya ZÇW û ger hebe nirxandina bi deqdanê hatiye kirin.
- li ser derfetên perwerdehiyê agahdarkirina dayikûbavên ji paşxaneya koçberiyê
- di nirxandina şagirtan de û her wiha di payedan an biryara neqandinê de şarezayiyên zimanê welatê-jêder ên zarokan di hîndekariya ZÇW de bidest xistine, li ber çav werin girtin.

Wek di stratejiya hîndekariya zimanê netewî ya bi dîroka 2004an a EDK de hatiye pêşdîtin, di hîndekariya ZÇW de *zimanên welatê-jêder* ên zarokên xwedî paşxaneya koçberiyê, teşwîq dike (bide ber hev: Hîndekariya ziman a li xwendegehên mecbûrî: Stratejiya EDK û plansaziya kar a ji bo giştiya koordînasyonên swîsrî ya 25.Adar.2004). Heman armanc bi peymana navkantonî ya li ser bihevkirina xwendegehên mecbûrî pêk tê, ji ber ku kantonên pevkar bi piştgiriya hîndekariya ZÇW a ji aliyê olî û siyasî ve bêalî erkdar in (bide ber hev: xwendegehên mecbûrî (HarmoS) ya 14. Hezîran.2007). Ji sala 2011an û vir ve, Hikûmeta Federal di çarçoveya Zagona Zimanan de piştgirî dide projeyên hîndekariya ZÇW (bide ber hev: Zagona Hikûmeta Federal a li ser Zimanên Neteweyî û Têgihîştina di Navbera Civakên Zimanan de (Zagona Zimanan, (SpG) ya 5ê Cotmeha 2007an û Biryarnameya li ser Zimanên Netewî û Têgihîştina di Navbera Civakên Zimanan de (Biryarnameya Zimanan, (SpV) ya 4ê Hezîrana 2010an).

### Bingehan zagonî yên li kantona Zurichê

Li kantona Zurichê hîndekariya ZÇW bi awayê hiqûqî li gor Zagona Xwendegehên-gel û Rêvebirnameya Xwendegehên-gel tê sazkirin:

**Zagona Xwendegehên-gel a 7ê sibata 2005an**
**§ 15.**
1 Birêvebiriya perwerdehiyê, dikare kursên Ziman û Çanda Welêt ên ji aliyê rayedarên derveyî xwendegehên fermî ve tên pêşkêşkirin, nas bike.
2 Biryarname, şertên pejirandinê û şopandina wan saz dike.

**Rêvebirnameya Xwendegeha-gel a 28ê Hezîrana 2006an**

**§ 13**
1 Di kursên ziman û çanda welêt de zarokên xwedî zimanê biyanî, agahiyên xwe yên bi zimanê-yekem û zanîna li ser çanda welatê xwe yê-jêder bi pêş de dibin.
2 Berpirsyariyên van kursan, balyozxane yan konsulxaneyên welatên-jêder in. Birêvebiriya perwerdehiyê, dikare kursên birêvebiriyên din jî nas bike (bi awayê fermî bipejirîne).
3 Kurs, gava li gor Çarçoveya Planê Hînkirinê yê ji aliyê Şêwra Perwerdehiyê ve hatiye amadekirin be û bê armanca qezenckirinê û ji aliyê ol û siyasetê ve bêalî be, tê nasîn (tê fermîkirin). Ev kurs di hefteyê de herî zêde bi giştî çar ders in, lê ji bo asta bexçê zarokan û ji bo pola 1. a xwendegeha seretayî herî zêde du ders in.
4 Divê mamoste xwediyê şarezayiya têrkar a hîndekariyê û asteke têr a zimanê almanî bin û tev li perwerdehiyên mecbûrî bibin.

**§ 14**
1 Kurs heta derfet hebe, di kêliyên derveyî demên hîndekariyê de tên dayîn.
2 Şaredarî;
a.Li gor derfetan polên rewa bi awayekî belaş pêşkêş dikin.
b.Ger kurs di dema hîndekariyê de tê dayîn, herî zêde hefteyê du dersan destûra derketina ji hîndekariya asayî bidin şagirtên beşdarî kursê bibin.
c.Di birêvebirina kursê de gazincên xwe, ragihînin birêvebiriya perwerdehiyê.
3 Nirxandinên bi deqdanên di kursê de werin kirin, wê di bawernameyê de werin nivîsandin.
4 Birêvebiriya perwedehiyê rêgezên pêvajoya qeydkirina li kursan diyar dike. Wekî din birêxistinkirin û birêvebirina kursan, bi taybetî fînansekirin û herwiha neqandin, bicîkirin û çavdêrîlêkirina mamosteyan kar û erka birêvebiriyên kursan e.

**Li kantona Zurichê birêxistinkirin û birêvebirina hîndekariyê**
Li jêr wê pratîka ZÇW a li kantona Zurichê ya ji ber şert û mercên zagonî yên li kantonê hatiye bipêşdebirin, were vegotin.

**Nasîn (fermîkirin) a birêvebiriyên kursan**
Birêvebiriya perwerdehiyê dikare kursên ZÇW ên ji birêvebiriyên derveyî xwendegehê gava pêwîstiyên zagonî û rêgezên hundurîn pêk bînin, binase. Saziya Xwendegeha-gel prosedûra naskirinê saz dike û bi rê ve dibe.
Ger ji xwe kursên ZÇW ên di zimanê têkildar de hatine nasîn hebin, bi birêvebiriya heye re têkilî tê çêkirin û li riyên hevkariyê tê gerîn. Armanc ji bo her zimanî pêşnîyareke ZÇW a yekgirtî û berfireh e.

Ji bo birêvebiriyeke kursê were nasîn, divê bi taybetî van şertên li jêr bi cih bîne

- ew ewle bike, ku kurs li gor Çarçoveya Planê Hînkirinê yê ZÇW ne û ji aliyê olî û siyasî ve bêalî ne,
- mamosteyên pispor ên ZÇW yên bi asta zimanzaniya almanî ya tê xwestin, dersan bidin,
- kurs ne bi armanca bidestxistina pereyan bin,
- bi xwendegehên herêmî û birêvebiriya perwerdehiyê re bi hevkarî bixebitin.

**Bawername û derbaskirina ser bawernameya xwendegehê**
Binêre li beşa 3, rûpela 9

**Çavdêrî**
Hîndekariya ZÇW ji aliyê pedagojîk û xebatkaran ve di bin çavdêriya birêvebiriyên wê de ye. Ji aliyê xalên di rêziknameya xwendegeha-gel de hatine sazkirin ve, di bin çavdêriya rayedarên xwendegehê de ye.

Sehkirina beşdaran û girtina tedbîrên pêwîst ên li hember beşdarên kursan ên nebirêkûpêk erka birêvebiriyên kursan e. Ew li ser daxwazê, agahiyên li ser sehkirina tevlêbûna beşdaran û rewşa hîndekariyê didin rayedarên xwendegehê. Mafê sehkirinê yê mamosteyên xwendegeha-gel ên şagirtên xwe bi sedema tevlêbûna kurseke ZÇW ji dersên xwe derdixin jî heye.

Gava gilîûgazincek bi mamosteyên tev lê bûne re rasterast nikaribe were çareserkirin hebe, di navbera rayedarên xwendegehê û birêvebiriya têkildar de gotûbêjek tê kirin. Ger tevî vê bibîranînê gilîûgazinc ji holê neyê rakirin, birêvebiriya perwerdehiyê dikare li ser serlêdana rayedarên xwendegeha gel destûra birêvebirina hîndekariyê ya li xwendegeha-gel ji dest birêvebiriya têkildar paşde bistîne.

**Fînansekirin**
Fînansekirina hîndekariya ZÇW erka birêvebiriyên kursan e. Kêmek şaredariyên xwendegehan hinek alîkarîya aborî didin an jî hin mamosteyên ZÇW bi xwe digirin ser kar. Ji bo piraniya birêvebiriyên kursan, dêûbav jî bi dayîna hinek pere piştgiriyê dikin.

**Mamosteyên-ZÇW**
Neqandin û bicîkirina mamosteyên ZÇW erka birêvebiriyên kursan e.

Ji bo vê, birêvebiriyên kursan li ser radiwestin, ku mamosteyên ZÇW yên nû beşdarî xebatên hîndekariyê yên li kantonê dibin,

- bi awayê pedagojîk têra xwe pispor bin (dîplomeya mamostehiyê yan xwendina di wê astê de yan jî tecrube û bipêşdebirina xwendinê ya têrê dike hebe),
- şarezayiyên almanî yên devkî têrê bikin (têrêkirina xwe bi bawernameyekê nîşan bidin, ku li gor Çarçoveya Referansa Ewropî gihiştine asta B1),
- tev li civînên agahdariyê yên ji aliyê birêvebiriya perwerdehiyê (saziya xwendegeha-gel) ve tên lidarxistin, bibin,
- beşdarî modula danasînê ya ji aliyê Xwendegeha Bilind a Pedagojî ya Zurichê ve li ser daxwaza Birêvebiriya Perwerdehiyê tê dayîn, bibin.

Ger mamosteyeke/î ZÇW şertên li jor pêk neyne, Birêvebiriya Perwerdehiyê ji birêvebiriya berpirsyar girtina tedbîrên rastkirinê dixwaze. Ger hewce be, Birêvebiriya Perwerdehiyê dikare lîsansa mamosteya/yê ZÇW ya/yê têkildar a dayîna dersên ZÇW yên li kantonê tên nasîn bi paş de vekişîne.

Ji bo xebatên hîndekariyê yên mamosteyên ZÇW hînbûna şertûmercên xwendegehên herêmî, bi fêde ye. Ji ber vê yekê, ji birêvebiriyên kursan re tê pêşniyarkirin, ku hema piştî çend salekê mamosteyên ZÇW neguherînin ("prensîba pêguherînê" tine).

**Agahî û serlêdan**
Hem birêvebiriyên kursan û hem jî xwendegehên herêmî û saziya xwendegehên-gel zarokên têkildar û dêûbavên wan li ser kursên hene agahdar dikin. Zarok dikarin ji temenê bexçê zarokan an ji demeke piştretir – li gor pêşkêşkirina zimanê têkildar, tev li kursan bibin –

Mamosteyên xwendegeha gel di meha Çile de forma qeydkirinê li ser dêûbavan belav dikin.

Dêûbav zarokên xwe rasterast li cem kesa/ê kursa ZÇW bi rê ve dibe qeyd dikin. Birêvebirên kursan dêûbavên zarokan di demê de û rasterast li ser taybetiyên hîndekariyê (dem, cih, mamosteya/ê ZÇW) an jî li ser gumana pêknehatina kursan agahdar dikin. Hîndekarî bi gelemperî di destpêka sala xwendinê de dest pê dike. Serlêdan tevlêbûneke birêkûpêk ferz dike, betalkirin jî tenê dikare bi riya dêûbavan di dawiya sala hîndekariyê de bi nivîskî pêk were.

**Pirtûkên hînkirinê û alavên hîndekariyê**
Peydekirina pirtûk û alavên hîndekariyê erka birêvebiriyên kursan e.

Ji şaredariyên xwendegehan re tê pêşniyarkirin, ku mamosteyên ZÇW karibin alavên teknîkî (yên wek mekîneya jiberzêdekirinê û ger hebe bîmer/dîtbarok, kompûter, têketina înternetê û tiştên din), herwiha alavên hîndekariyê (yên wek kilspî/qelem, defter, kaxez û yên wek wan) belaş peyde bikin.

**Demên hîndekariyê û cihên hîndekariyê**
Şagirt ji bexçê zarokan û pola yekem a xwendegeha seretayî ve dest bi hatina hîndekariya ZÇW dikin û di hefteyê de herî zêde tev li du dersan, li polên pêşdetir jî, di hefteyê de herî zêde tev li çar dersan dibin. Hîndekariya ZÇW, ger derfet hebe, di hundirê plansaziya demên hîndekariyê yên xwendegehê de (8 heta 12, 13.30 heta 17) tên çêkirin. Di vê çarçoveyê de herî zêde du saet ji saetên dersên fermî dikarin werin veqetandin. Di vê rewşê de zarokên têkildar ji hîndekariya peywendîdar tên derxistin, (-da ew karibin tev li dersên ZÇW bibin).

Di bihara her salê de, birêvebiriya kursan ji berpirsiyarên xwendegeha cîgehî/herêmî cihê polê dipirsin û demên dersê yên dixwazin, destnîşan dikin. Demên diyarkirî wê piştî şêwra di navbera birêvebiriya kursê û rayedarên xwendegeha cîgehî/herêmî de werin destnîşankirin.

Hîndekariya ZÇW heta derfet hebe wê li polên xwendegehên seretayî yên herî nêzî cihûwarê zarok lê niştecî ne, werin dayîn. Şaredariyên xwendegehan, li gor derfetên xwe, polekê belaş didin. Mamosteya/ê ZÇW li gor rêzikên xwendegehê tev digere.

Birêvebiriyên kursê, destpêka sala hîndekariyê, li ser rêxistiniya hîndekariyê ya diyar bûye (pol, dem, cih, mamosteyên ZÇW), agahiyê didin berpirsyariyên xwendegeha cîgehî/herêmî. Birêvebiriyên kursan van agahiyan bi armanca agahdarkirina li ser hîndekariya ZÇW û koordînasyon û piştgiriya wê, radigihînin saziya xwendegeha-gel jî.

**Hevxebata di navbera mamosteyên ZÇW û xwendegehên herêmî de**
Ji mamosteyên xwendegeha gel û mamosteyên ZÇWê re tê pêşniyarkirin, ku beramberî bi hev re têkiliyê deynin. Ji bo berpirsyariya xwendegehê vexwandina mamosteyên ZÇW a konferansa xwendegehê ya ji bo danûstendina mijarên bi kêrî her du aliyan tên, baş e. Her weha ew dikarin carina -wek mînak salê carekê, mamosteyên ZÇW vexwînin konferansên xwendegehê. Armanca hevdîtinên bi vî rengî hevnasîna beramberî, pevguhertina agahî û tecrubeyan yan jî axavtina li ser pirsgirêkên hevbeş e.

Dersa ZÇW pêşkêşiyeke di bin banê xwendegeha-gel de ye. Cihgirtina mamosteyên ZÇW a di çalakiyên xwendegehê û pêvajoyên pêşveçûna xwendegehê de watedar e. Bi taybetî xwendegehên ku jimareke zêde ya zarokên duzimanî yan pirzimanî lê hene, ji hevkariya sazîkirî sûd werdigirin. Ev tê wê wateyê, ku piştgirîkirina zarokan a bi hev re, pêkanîna projeyên hînbûna pirzimanî û *transçandî* an jî bi hev re agahdarkirin û şêwirmendiya dêûbavan. Ne tenê mamosteyên pola asayî, lê pisporên xwendegeha seretayî, wek mînak mamosteyên dersên almanî wek zimanê duyem (Awzd/DaZ) jî dikarin ji vê hevkariyê sûd bigirin.

Mamosteyên ZÇW ên ku di vê mijarê de pirspor in, bi awayê serkevtî beşdarî werger û navbeynkariya trans*çandî* dibin. Pir watedar e, ku mamosteyên ZÇW di nirxandina li ser zarokên ew wan hîn dikin de -di nirxandina asta hînbûna wan de, di dema gotûbêjên cihî yên li ser xwendegehê û biryardana bipêşdeçûnê de, amade bin.

Saziya xwendegeha-gel pêşniyarî xwendegehan dike, ku di rewşa hebûna jimareke zêde ya zarokên duzimanî yan pirzimanî de, hîndekariya ZÇW wek beşeke bipêşdebirina ziman were hesibandin û bixin nav bernameya xwendegeha cîgehî/herêmî.

**Piştgiriya xebata bi hev re ya xwendegehê - dêûbavan**
Xebata bi hev re ya di navbera xwendegeh û malbatan de di bingehîn de, bandoreke mezin li ser hînbûn û serkeftina xwendina zarok û ciwanan dike. Ger mamosteyên ZÇW bi rêkûpêk bi dêûbavan re di têkiliyê de bin, wan li ser tiştên li xwendegehê diqewimin agahdar bikin û bi wan re gengeşe bikin, bê ew çawa dikarin di hînbûnê de piştgiriyê bidin zarokên xwe, ev yek bandoreke erênî li ser serkeftina hînbûnê dike.

Mamosteyên ZÇW dikarin di xebata bi hev re ya bi dêûbavan re piştgiriyê bidin mamosteyên xwendegeha-gel. Wek mînak, ew di çalakiyên li xwendegehê tên sazkirin de dixebitin an di civînên yek-bi-yek de wergerê dikin. Wekî din ew dikarin di rewşên li ser duzimananî û sazûmana xwendegehê agahiyên baş tên xwestin de, navbeynkariya *transçandî* jî bikin. Ew xizmetên wiha li gor peymana bi mamoste û rayedarên xwendegehê re pêk tînin.

**Hevkariya bi rêvebirên xwendegehê re**
Rayedarên xwendegeha cîgehî/herêmî alîkariyê dikin, ku hîndekariya ZÇW di nav şert û mercên baş de li xwendegeha-gel pêk were. Ji wan re tê pêşniyarkirin, ku li gor hewcedariyê ji bo koordinasyona li şaredariyê yan li yekîneya xwendegehê kesekê/î wek berpirsyar diyar bikin. Berpirsiyariya wê/wî ye, ku li ser şikildana-planê-saetên-dersê û hewcedariyên ciyê kursê peymanên pêşîn çêke û hevkariyê bi pêş de bibe.

**Xebata bi hev re û koordinasyona di asta kantonê de**
Li ser navê aliyê Birêvebiriya Perwerdehiyê, Saziya Xwendegeha-gel ji koordînekirina dersên ZÇW û dayîna piştgiriya îdarî berpirsiyar e. Bi navê aliyê saziya kursê pêşkêş dike jî, her birêvebiriya kursê kesekê/î, wek berpirsiyara/ê koordinasyona asta herêmî û kantonî ya/yê ji xebata hevbeş a bi Saziya Xwendegeha-gel re, diyar dike.

Bi vê sedemê du komcivîn li ser danûstendina agahdariyên girîng, zelalkirina pirsên têgînî û rêxistinî û herwiha gengeşekirina aliyên pedagojîk, radiwestin. Ev "Konferansa ZÇW" û "Komîteya Amadekariya Konferansa ZÇW" ne. Di konferansa ZÇW de, berpirsyariyên kursan û herwiha nûnerên saziyên standard (yek ji nûneriya mamosteyan, yek ji ya rêveberiya xwendegehê, yek ji ya mamosteyên almanî wek zimanê duyem (Awzd/DaZ) û yek ji desteya birêvebiriya xwendegehê) cî digirin. Wekî din Komîteya Amadekariya Konferansa ZÇW, Xwendegeha Pedagojî ya Bilind a Zurichê ya ku li ser kardayîna Birêvebiriya Perwerdehiyê ji bo mamosteyên ZÇW perwerdeyan dide jî, tev li civînê dibin. Di Komîteya Amadekariya Konferansa ZÇW de, nûnerên hatine hilbijartin ên birêvebiriyên kursên ZÇW cî digirin.

Birêvebiriyên kursên ZÇW li ser xebatên xwe bi awayekî birêkûpêk raporê didin Saziya Xwendegeha-gel. Ji bo vê, ew bersiva pirsên taybetî didin û planê xwe yê hînkirinê yê wergerandine almanî û belgeyên din pêşkêş dikin.

# Pêvek II: Ast û mijar – awirek giştî

**Ev lîsteya mijaran wek piştgiriya ji bo plankirin û şikildana hîndekariyê hatiye hizirîn. Ew nêrîneke giştî li ser bikaranîna kîjan mijar di kîjan astên xwendegehê yên di hîndekariya ZÇW de dikarin werin bikaranîn, dide. Di navê de gelek pêşniyarên mijaran hene. Ji ber bisînorbûna jimara dersan, divê mamoste neqandinekê bikin.**

**Mijar jî parçeyekî Planê Hînkirinê-21ê ne û di polên asayî yên xwendegeha-gel de tên bikaranîn. Mijarên têkildar ên qadên şarezayî yên Planê Hînkirinê-21 bi girêdankê bi lîsteya li jêr ve hatine girêdan.**

**Mijar**
## Ez û yên din – jiyana bi hev re

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.10 / OÇE.1 / OÇE.2 / OÇE.5**

Asta 1
- Hevnasîn, silavdan, xwedanasîna beramberî
- Awayên kevneşopî û rêzgirên danûstendinê, yên li bexçê zarokan / li xwendegehê: rêzgir, birêveçûna dersê û adet, livûtevgerên dubarekar
- Bi giştî bi yên din re kirina tiştinan an tecrubekirin; hevaltî, devjengî, tiştên dikarim bi tenê xwe bikim

Asta 2
- Kom û çandên cihêreng: rêzgir û nirxên wekhev û cuda, rêzgirtina beramberî û nasîna herdu aliyan, nakokî û stratejiya çareserkirinê
- Ez kî me: çi min dike ez, ez girêdayî ku me
- Rolên zayendî: kur – keç
- Mafên zarokan

Asta 3
- Kes û kom, girêdayîbûn an biyanîbûn
- Jiyana bi hev re ya piraniyan û kêmîneyan: Nijadperestî, gengeşe û bûyerên rojane
- Mînakbûn û rêberbûn: ji werzîş, zanyarî, çand û dîrokê
- Têkiliyên bi zayenda xwe û zayendên din re (hêvîkirinên taybetî yên çandî jî)
- Mafên mirovan

Mijar
## Malbat

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.10 / OÇE.2 / OÇE.5**

Asta 1
- Malbata min û xizimtî; rêzgir û adetên di nav malbatê de

Asta 2
- Di nav malbatê de parvekirina kar û erkan
- Dîroka malbata min: Nifş û dara malbatî
- Awayên cihêreng ên malbatê

Asta 3
- Rolên endamên malbatê: guhertinên bi demê re, cudayiyên çandî
- Têgihiştina min (bi xwe) ya rolan
- Di girêdayîbûna dîrok û çandê de bikêrhatinî û awayên malbatê
- Nirxên xweyî; exlaq

Mijar
## Lîstik û dema vala

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.10 / OÇE.5**

Asta 1
- Lîstin: bi hev re û li cihûwarên cihêreng bi lîstokên cihêreng; lîstik û lîstokên nûjen û yên kevneşopar
- Dema vala û hobî
- Amûrên destkariyê û alavên xebatê.

Asta 2
- Xwerehetkirin û vehisîn
- Livûtevgerên dema vala; werzîş, koma hevalan; komele
- Mijûlbûna bi medya dîjîtal û medyayên din re
- Reklam

Asta 3
- Xwerehetkirin û vehisîn
- Livûtevgerên dema vala; hevdîtina ciwanan, çanda ciwanan (muzîk, ziman); koma hevalan, komele
- Mijûlbûna bi medya dîjîtal û medyayên din re
- Reklam

**Mijar**
## Niştgeh, tax û bajar

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.8 / ODC.3 / ODC. 4**

**Asta 1**
- Hawîrdora li bexçê zarokan û ya li xwendegehê
- Mala me / xaniyê me û hawîrdor

Asta 2
- Xanî (avayî) û niştgeh

Asta 3
- Niştgeh û rêbaza lêkirina avahiyan; bipêşdeçûnên dîrokî

**Mijar**
## Şahî, adetên herêmî û mode

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve**
**XMC.7 / ODC.2**

Asta 1
- Rojbûn û şahiyên din ên girîng, awayên cihêreng ên şahiyan
- Cilûberg û cilûbergên li gor her şahiyekê bi awayekî

Asta 2
- Pîrozbahiyên cihêreng ên şahiyan; kevneşopiyên olî
- Modeyên cilûbergan di guherteya demê de; cilûbergên pîşeyî, cilûberg û rol/rewş, cilûbergên bûne marka

Asta 3
- Çanda derketina derve û şahiyên şevê (partî)
- Di guherteya dîrokî de mode û hînbûniyên tên dubarekirin (adet)

**Mijar**
## Tenduristî û xwarin

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.1 / XT.7**

Asta 1
- Laşê min û laşê mirovan: endamên laş
- Yekeriya laşê min û yên din; pênc hest
- Paqijî
- Lênêrîna bijîjkî
- Xwarin û vexwerina tenduristî, hînbûniyên xwarinê

Asta 2
- Tenduristî û nexweşî; rêbaza domandina jiyîneke tenduristî
- Xwarinûvexwarina jiyanî ji ku dertê, şînayî û fêkî yên li gor demsalê

Asta 3
- Werzîş, girêdayîbûn (kêşbûn)
- Xwarin; çandên xwarinê yên cihêreng ên girêdayî çand, dîrok û niştewariyê
-

**Mijar**
## Erdnîgarî

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.8**

Asta 1
- Navnîşanên erdnîgarî yên ji qada tecrubeyên zarokan (niştgeh, welatên-jêder, Swîsre, welatên cînar û hwd.); Têgehên bergehê (têgehên aliyên cînîşanî)
- Welatê min ê-jêder: Awireke giştî li ser erdnîgariyê, avhewa

Asta 2
- Av, çiya û bajarên girîng ên welatên-jêder

Asta 3
- Taybetiyên erdnîgarî yên herêm û welatên jêder

**Mijar**

## Xweza û teknîk

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.2 / XMC.3 / XMC.4 /XT.1 / XT.2 / XT.8 / XT.9**

Asta 1
- Ajal; ajalên kedî; ajal û şînayî; daristan
- Fêkî û sewze; çar element
- Demsal û veguherînên li xwezayê
- Têgehên demîn (sal, meh, hefte, roj, demjimar -saet- êvar, nîvro, doh, îro, sibeh û hwd.), demên saetan
- Amûrên navmalê (têkberên navmalî)
- Siwarokên-livok ên zarok karibin bi xwe bi kar bînin (duçerxe/bisiklêt, xwelivok (trottinet), skûter û hwd.)

Asta 2
- Cureyên ajalan û cureyên şînayiyan (cureyên riwekan)
- Xeleka xwexwedîkirinê (ya xwarinûvexwarinê)
- Hewa û pêşbîniyên hewayê
- Parastina jîngehê, kerasetên jîngehî
- Lîstokên dîjîtal, amûrên (alavên) ragihandinê

Asta 3
- Ekolojî, xeterî û parastina jîngehê (jinûvebikaranîn û avêtina bermayî û çopê jî di navê de)
- Gengeşeyên nû yên zanyarî (ceribandinên li ser ajalan, lêkolînên genetîkî û hwd.)
- Lîstokên dîjîtal, amûrên (alavên) ragihandinê

**Mijar**

## Wêje û huner

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**ziman**

Asta 1
- Stran, metelok û pêkenok, çîrok û çîvanok, pirtûkên bi wêne
- Reng; fîlm
- Çêkirina bi xwe ya destkariyê û bi yên din re axavtina li ser

- Asta 2
- Helbest, destan, fabl, helbest; pirtûkxaneya navçandî
- Fîlm

- Asta 3
- Mînakên ji wêjeya klasîk û nûjen
- Fîlm
- Hunerên dîtbarî, muzîk û beşên din ên hunerî; hunermend

**Mijar**
## Raborî û dîrok

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.9 /CDC.6 / CDC.7 / CDC.8 / OÇE.4**

Asta 1
- “Gava ez biçûk bûm”
- Cudayiyên navbera berê - niha
- Serpêhatiyên kesanî yên li welatên-jêder: geştûger, bînvedan

Asta 2
- Dîroka (çîroka) malbata min; koçberî (penaberî)
- Dîroka welatên-jêder: bûyerên girîng, efsaneyên li ser eslê xwe (derketina holê)

Asta 3
- Jînenîgariya min (wek mînak li ser hînbûn an zimanan)
- Bipêşdeçûnên îroyîn ên civakî û siyasî yên li welatên-jêder
- Ol û bîrûbawerî (nêrîna li cîhanê)
- Perwerdeya siyasî (wek mînak, hilbijartin û dengdan)

**Mijar**
## Cîhana kar û bidawîanîna xwendinê

**Girêdanka bi mijarên Planê Hînkirinê-21 ve:**
**XMC.6 /AKK.1 / AKK.2 / AKK.3**

Asta 1
- Pîşeyê mirovên ji derdora xwe ya kesî; pîşeyên li xwendegehê û li cihûwarên (wek mînak mêvanxane, polîs, nexweşxane, firşgeh û hwd.)

Asta 2
- Pîşeyê xeyal dike; kesayetên mînakî yên ji beşên pîşeyên cihêreng
- Wateya bidawîanîna perwerdeyê û kar

Asta 3
- Neqandina pîşeyî û derbasbûna cîhana pîşeyî yan jî derbasbûna xwendegeheke pîşeyî ya li Swîsreyê û li welatên jêder: Pîşe û pêdiviyên wan, cudayiyên di navbera welatan de
- Pîşe û nasname; bikaranîna şarezayiyên xwe yên zimanî û transçandî; pirsên li gor taybetiya zayendan
- Aborî: beşên cihêreng, bipêşdeçûna dîrokî, bêkarî, sendîka.

# Pêvek III: Çavkanî

**Ev pêvek çavkaniya di metnê de hatiye vegotin vedihewîne. Hilbijartinek berfireh a materyal, wêje û çavkaniyên din ên ji bo bipêşdebirina zimanê yekem û pirzimaniyê dikare li ser malpera Saziya Xwendegeha-gel were dîtin: www.zh.ch/hsk**

Beşa Bipêşdebirina Perwerdehiya Navneteweyî (Projeyên Navnetewî yên Perwerdehiyê) ya PH Zurich (2018): Materyalên ji bo hîndekariya zimanên welatên-jêder; mijûlbûna bi zarava û zimanê standard re, Zurich: Xwendegeha Pedagojî ya Bilind a Zurichê.
Birêvebiriya Perwerdehiyê ya Kantona Zurichê (2017): Planê-hînkirinê yê ji bo xwendegehên-gel ên kantona Zurichê.

Guidici, Anja û Buhlmann, Regina (2014): Hîndekariya Ziman û Çanda welêt (ZÇW/HSK) Neqandinek ji pratîkeke baş a li Swîsreyê, Bern: Sekreteriya giştî ya EDK.

